



Kes bi gotinan naxape, divê hin gay bên avêtin

Hevpeyvîn Yakup Bilge
Berê Suryanî ji bo
kurdan bi tenê fileh
bûn lê îro gel in

Rûpel 8-9

Sirwan Rehîm
Zindîkujiya mirîperest

Rûpel 11

Nûçe:
Li Kurdistanê
Newroz

Rûpel 15

NAVEROK



6

Zülküf kışanak: Dîroka nêzdf du şoreşgerî



7

Sevda Eldemir: Mînakin ji xwarinên kurdî



13

D.Ş. Tizyanî: Kovareke nûderketî û pirtûkeke

Ji Xwendevanan

GELÊ kurd bi ked û berxwedana xwe Newroz parastîye, ji bo vê parastinê jî bêqedar xwîn û berdêlên giran dane û hê jî dide; gava tiştêk neditine ku pê agirê Newrozê gur bikin, bedena xwe kirine agirê Newrozê.

Erê gelên din jî hene ku Newrozê pîroz dikin, lê belê ne bi naverok û rastiya ku di Newrozê de ye.

Wekî her dem îro jî gelê kurd di bin rêbertiya Kawayê hemdem de li dijî Dehaqê nûjen di têkoşîn û berxwedanê de ye.

Agirê Newrozê wê careke din bisincire, wê gur û bilind bibe, bi xwe re Dehaqên nûjen bişewitîne, ewrên reş li ser kelehên zordestiyê çêke, têrêsen tirs û xofê di dilê zaliman de biafirîne. Wê careke din gelê kurd li dijî zilm û zordestiyê dengê xwe bilind bike û helbest û awazên serfirazî û serkeftinê bibêje.

Îro em dibînin ku dewleta tirk dixwaze Newrozê mîna cejneke tirkî nîşan bide, wê ji naveroka wê dûr bixe û nava wê vala bike. Lê dewleta tirk çiqas hewldana ji bo vê yekê bike jî, nema dikare gelê kurd bi fen û fûtên xwe bixapîne.

REMEZANÊ HÛRÎ



Stranek, PKK û mirîşka birçî

SAMÎ TAN

Rayedarên dewleta tirk her sal bi dahol û zirneyan îlan dikin ku PKK qediyaye, hew dikare tiştêkî bike, lewre jî ewê êdf ji bo pêşvebirina 'herêmê' dest bi xebatê bikin.

Van rojan dîsa dest bi heman stranê kirin. Hinek rojnamegerên biyanî birin Kurdistanê da ku serkeftina xwe nîşanî wan jî bidin. Lê dema rojnamegerekî amerîkî xwest bi serê xwe bigere, ew girtin û 19 saetan bi di binçav de hiştin. Leşkerên tirk bi devê xwe jê re gotin "PKK li her derê ye." Lê ji ber ku awaza vê stranê dilê wan xweş dike, dev ji strînê bernadin. Çapemeniya tirk jî li ser rêça leşkeran dimeşe, tiştên ku di brîfîngan de ji ber kirine, nizanîm çend bare dike.

Bi taybetî piştî daxuyaniya Çevik Bir a li Amerîkayê, qelemşorên tirk dest bi nixandî û nivîsîn li ser 'serdema piştî têkçûna PKK'ê" kirin. Bo nimûne di Turkish Daily Newsa 27'ê adarê de Hayri Birlerê ku ji ali-

yê rojnamevanê biyanî ve wekî zilamê MÎT'ê dihat binavkirin, bi sernavê "Kurd çî dixwazin" nivîsek darijtiyê.

Birler beyî ku bala xwe bide bi deh-hezaran kurdên ku beşdarî pîrozbahiyên Newrozê bûn û bi dirûşmên xwe doza kurd û Kurdistanê bilind kirin, dibêje ku êdf gelê kurd doza tu mafên neteweyî nake, bi tenê dixwaze zikê tîr bike. Li gorî wî, kesên bi yek dengî dibêjin: "Bijî Serok Apo", "Bijî ERNK, ARGK, PKK" ne mirov in, belkî meçêtir (cin) in, lewre kurd êdf piştewaniya PKK'ê nakin. Bi dîtina Hayri Birler ewrûpiyên ku qala çareseriyê siyasî û agirbestê dikin, haya wan ji van rastiyan ezmanî nîn e. Ji ber agahiyên çewt ên kesên xêrnexwaz doza van tiştan dikin. Kesên ku dilê xwe bi vê stranê xweş dikin, dîsa qala hin pakêtan dikin. Lê di pakêta wan de wekî her car mafên kurdan nîn e. Jixwe kurd tu mafî naxwazin, bila zikê wan tîr

bibe bes e.

Kes napirse ger wisa ye, ji bo çî her roj mirov tîne windakirin, gund tîne şewitandin? Hêzên kontrayî çîma nayêne tasfiyekirin? Kesên ku bi dehan mirov kuştine çîma nayene girtin? Her roj cendekê mirovên sivil li kêleka rîyan tîne dîtin û kujerên wan kesan ji aliyê dewleta ku ketiyê derdê tîrkîna zikê kurdan ji ber çî nayêne girtin?

Em kurdan bihêlin li aliyekî, heke rayedarên dewletê ew qas dilovan in, bila zikê gelê tîr tîr bikin. Gelê kurd bi salan e ku digel ew qas zilm, zorê û xizaniyê dev ji mafên xwe yê neteweyî bernade. Ev yek di Newrozê de bi çalakiyên xwe nîşan da. Her çî kesê ku hinekî sincê pişeyî pê re heye dipejirîne ku gelê kurd mafên xwe yê neteweyî û însanî dixwaze.

Îcar tiştê xerab, wekî ku pêşiyên me jî gotine, hinek 'mirîşkên' me yê birçî jî xwe di ambara garis de dibînin, bi hêviya van rojên ku wê ew stran rast derkeve, destê xwe li ber rayedarên dewletê girê didin. Bersiva wan jî kesên ku dixwazin wan ji vê xewnerojkê hişyar bikin re jî amade ye: "Haya we ji dinyayê nîn e."

Hezkirin

MIZGÎN AYDIN

Ji roja ku me xwe nas kiriye, ji gotinên ku me bihîstîye ya herî xweş û şêrîn 'hezkirin' e. Dema ku gotina 'hezkirin' û 'evîn' tî gotin, dilê mirov mîna çivîkekî ku nû bi firê dikeve, dilve, bilind dibe û rûyê mirov mîna gula berbangê geş dibe.

Ji ber ku, "hezkirin" bingeha mirovahiyê ye, di bingeha mirovahiyê de jî ked heye. Ango, mirovahî û hezkirin, bi awayekî şidandî bi hev ve girêdayî ne û berdêla 'hezkirin' e jî, gelekî giran e. Lewre hezkirin mîna çiyayekî asê û bilind e. Kesên tirsonek, dexos (çav nebar), dizek (ne kedkar), qure û paşverû nikarin xwe bigihîjinîn vî cihê herî xweş û tu car dilgeş nabin.

Em li ser hezkirinê dipeyivin, belkî em xwe pir zana dihesibînin û li layiqî hezkirinê jî dibînin. Lê hema me got hezkirin ne erzan e. Lewre mirovahî pê ve girêdayî ye. Mixabin, tiştê ku di dîroka mirovahiyê de herî pir hatiye qirêjkirin û hatiye kuştin dîsa 'hezkirin' e. Lewre dema ku mirov ji heywantiyê vediqete, dest bi mirovahiyê dike; lê belê gava mirov bi malê taybetî dikeve, bi aliyê heywantiyê ve diçe. Ji ber ku malê taybetî angî dîzîna kedê, perçeqandîna kedê, kuştina kedê û kedkar; perçiqandîna û kuştina hezkirinê ye jî û loma ku piştî malê taybetî, hezkirin di hemû dem û çaxan de hatiye tunekirin. Lewre, cihê ku parastina berjewen-

Hezkirin girêdayî şervantiyê ye. Lewma jî di dîroka mirovahiyê de û li her derî, kesên ku herî kedkar, şoreşvan û herî duristin hatine hezkirin, bi xwe jî hez kirine û nemir bûne.

diyên şexsî, sextekarî û dizîti lê hebe hezkirin tune ye. Ji ber ku hezkirin bi keda azad çêdibe. Keda azad jî, karê mirovê azad e. Tê zanîn, ku keda belaş, an keda ji bo forsê jî heye. Ji ber vê rastiye, ancax mirovê azad, angî kesayetiya ji serî heya binî 'rêkxistî', dikare bi azadî kedkariyê bike û hez bike.

Dema ku em li gorî van rastiyan li radeya (sewiye) şervantiya xwe, kedkariya xwe binêrin, dê rewşa me, ya di hêla hezkirinê de jî derkeve holê.

Erê, heya ku aliyên me yê rizî, fenok, qure û dizek (belaş) hebin, em tu car nabin dijminê dijmin û dostê dostê xwe. Em tu car nabin şervanê welatê xwe, doza xwe, em tu car nayên hezkirin û dilgeş nabin. Lewre ev aliyên me yê rizî, mîna sitiriyên "Bekoyê Ewan" di heval û hogirên me re diçin û me tenê dihêlin; nahêlin ku em kedê bidin, werin hezkirin û hez bikin.

Tê dîtîn ku hezkirin girêdayî şervantiyê ye. Jixwe loma jî di dîroka mirovahiyê de û li her derî, kesên ku herî kedkar, herî şoreşvan û herî duristin hatine hezkirin, bi xwe hez kirine û nemir bûne.

Li gorî van rastiyan jî, gerek e em êrişî aliyên xwe yê rizî, qelsîtiyên xwe yê dijmin (lewre aliyên me yê xirab tev dijmin in) yê fenek, qure,

sextekar, dizek û nekedar bikin, hemû aliyên xwe yê 'Beko Ewan'iyê bikujin. Ji ber ku ancax wê gavê em dibin kesên herî kedkar, herî azad; bi vê re delal dibin, tîne hezkirin. Em dibin evîna dilê gelê xwe û hemû gelên din. Ancax wê gavê em dibin dijminê dijmin, hevalê hevalê xwe û em dikarin tiştên delal û azad biafirînin.

Mixabin, ger em xwe pir biçibînin, dîlnîzm û duristin nebin, dê yê ku werin ba me wê 'tobe' bikin û carekê din çavên xwe bi me naxin, wê me tenê bihêlin. Jixwe emperyalîzm jî dixwaze ku kesan tenê bi serê wan bihêle, bixê dilê mal û tiştan û ji hezkirina mirovahî û kedkariyê dûr bixe, bike heywan. Çî heyf e ku emperyalîzm hinek be jî gihiştîye armanca xwe.

Tê zanîn ku îro şoreşa me hem li welatê me, hem jî, gav bi gav li nav hemû cîhanê bi birdozîya nûjen, karvaniya dijwar û şerê pîroz hezkirinê diafirîne; angî, mirovan dide şerkirin, delal dike û dide hezkirin. Dîsa bar li ser milê kesan maye, yê ku bixwazin dê xwe bigihîjinîn radeya herî bilind.

Lewre rê li ber me ye. Hem jî zêrîn û rêya çiyayê asê, yê en bilind û rîya çiyayê hezkirinê, evîne û çiyayê azadbûnê.



■ Komeleya Mafê Mirovan Şaxa Amedê ban: Di roja 3 tîmeha 1996'an de li Bîngolê di şer de gerîlaya PKK'yî Sevî İnce bi birîndarî ketîye destê hêzên dewletê. Sevî İnce bi sê guleyan birîndar bûye û tedawîya wê nehatiye kirin. Piştî mehekê lêpirsînê ew avêtine Girtîgeha Bîngolê niha jî di Girtîgeha Amedê de ye. Heke di demeke kurt de neyê emelyatîkirin wê rewşa wê ya tenduristî bêtir xerab be.

Li aliyê din li gorî daxuyaniya IHD'ya Amedê ku Fikrî Özgen roja 27'ê reşemîya 1997'an jî aliyê polîsên sîvil ve hatiye girtin û heya niha der barê wî de tu agahî nehatiye standin. Di daxuyaniyê de tê diyarkirin ku, Fikrî Özgen 73 salî ye û nexweş e, bi alîkariya pompayê jiyana xwe didomîne.



HEYETÊN Îtalî û fîrandî piştî ku çûn Kurdistanê çavdêriyên xwe bi daxuyaniyekê pêşkêşî raya giştî kirin. Di dema serdana wan de asteng li pêşîya wan hatine derxistin, kesên ku agahî dane wan bi awayekî ne azad hereket kirine. Tê gotin ku gel aşîyê dixwaze, lê gelek gund hatine şewitandin an jî valakirin, ji ber kuştinên nediyar û windakirina mirovan ewlehiya mirovan nemaye, hêzên ewlekarî bi awayekî timî li ser gel zilm û zordariyê dimeşînin, pîroz-bahiyên Newrozê jî aliyê dewletê ve hatine astengkirin û ji 100 kesî zêdetir mirov hatine girtin. Heyetê xwest ku şer bê rawestandî û agirbestê dualî be îrankirin û ji bo vegera kesên ku gundên wan hatine şewitandin fîmkan bînin peyda kirin.

NÛÇE

Endamê PKDW'ê Ali Yiğit:

Kes bi gotinan naxape, divê hin gav bîn avêtin

Dewleta tirk çî wextê ku dixwaze dilê ewrûpiyan xweş bike, qala hin pakêtan dike, lê di dawiyê de her tim qanûnên şer û zordariyê derdikevin. Li aliyê din ewrûpî jî çî dema ku ji dewleta tirk îhaleyekê bistînin, kurdan jî bîr dikin. Lewre jî kurd divê pêşî bi xwe bawer bin, nemînin lê hêviya pakêtan vala.

Heftiya çûyî desthilatdarên dewleta tirk, der barê kêşeya kurd û mafên mirovan de hinek daxuyanî dan. Wek tê zanîn, heftiya rabûrî, Seroka Koma Sosyalîstan ya Parlemena Ewrûpayê Paulina Green û Serokê Koma Lîberalan ya Parlemena Ewrûpayê Gijs De Vries hatin Tirkiyeyê. Ev seredan watedar in, ji ber ku Yekîtiya Ewrûpayê di pûşpera 1997'an de, welatên ku wê karibin bibin berendamê Yekîtiya Ewrûpayê diyar dike.

Paulina Green û Gijs De Vries çûn seredana gelek siyasetvan û sazîyan. Piştî re jî wan da xuyakirin ku pakêta Tansu Çillerê ya ku di 6'ê adarê de pêşkêşî raya giştî kiribû, têrî pêwîstîyan

nake. Parlementerên ewrûpayî bi bir xistin Wezîra Karên Derveyî Tansu Çiller, bi gotinên xwe yê berî dema Yekîtiya Gumrukê pêbawerbûna wan şikênandîye lewre gotin û kirinên Tirkiyê dîr hev in. Green û Vries gotin, ji bo ku Tirkiyê karibe bibe berendamê Yekîtiya Ewrûpayê divê di warê kêşeya kurd û mafên mirovan de gawên berbiçav biavêje.

Piştî danûstandinên bi Paulina Green û Gijs De Vries re Wezîra Karên Derveyî Tansu Çillerê da zanîn ku li Tirkiyeyê îşkence tê kirin û wê îşkence bê berbenkîrin, kesên windayî wê bêne dîtin. Li gorî gotina Tansu Çillerê wê sala 1997'an jî bo Tirkiyê û cîhanê bibe sala pêşketinê girîng. Her wiha Şewirmendê wê Onur Öymen daxuyand ku, heya dawîya sala 1997'an di warê mafên mirovan de, di navbera Tirkiyeyê û welatên ewrûpî de wê tu arîşe (pirsgirêk) nemînin.

Gelo dewleta tirk, ji ber van rûdanan di helwesta xwe ya li hemberî neteweya kurd de, wê hin guherînan pêk bîne? Egerên wan daxuyaniyên dawî yê hundirîn û derveyî çî ne? Her wiha welatên Ewrûpayî jî ber kîjan egeran çareserîya arîşeya kurd dixwazin? Bi şeweyekî lêpirsînî me bersivên van pirsan dan ber ronahiyê, me dîtin û nirxandinên Endamê PDKW Ali Yiğit, Prof. Dr. Mahir Kaynak û Endamê Lijne-

ya Rêveberiyê ya Komela Mafên Mirovan (IHD) Turgay Kaya standin.

Endamê Parlemena Derveyî Welat Ya Kurdistanê Ali Yiğit, di nirxandinê xwe de bal kişand ser pêşketina têkoşîna rizgarî ya Kurdistanê û da zanîn ku gava dewleta tirk dikeve tengasiyê ji bo ku raya giştî bixapîne bi vî şeweyî tev digere. Yiğit gotina Süleyman Demirel, "Em realîteya kurd dînasin", bi bir xist û wiha axivî: "Siyaseta dewleta tirk ya berê nema dimeşe. Deh sal in ku em gotinên bi vî rengî guhdar dikin. Lê dewleta tirk nema dikare kesî bixapîne. Divê gavên berbiçav bîn avêtin."

Endamê PKDW Yiğit, der barê helwesta welatên ewrûpî ya li hemberî kêşeya kurd de, bi taybetî li ser berjewendiyên welatên ewrûpî yê Rojhilata Navîn rawestîya û da zanîn ku bi berde-wamkirina şer berjewendiyên wan dikevin xetereyê. Yiğit axaftina xwe wiha qedand: "Di vî pêvajoyê de tu hêz nema dikarin pêşîya têkoşîna rizgariya Kurdistanê bigirin. Doza kurdî di rojê va hemû cîhanê de cih girtiye. Welatên ewrûpî jî ber vî yekê dixwazin di demeke zûtirîn de kêşeya kurd çareser bibin."

Prof. Mahir Kaynak, di nirxandina xwe de gotinên General Çevik Bir bi bir xistin û guherîna nêzîkîdayîna hikûmetê, bi helwesta artêşa tirk ve girêda. Kaynak, da zanîn ku wê kêşeya kurdî bê çareser kirin. Endamê MÎT'ê yê berê Kaynak, nirxandina xwe wiha domand: "Bi dîtina min helwesta leşkeran nêzîkî çareseriyê dibe. Di vî warî de rola hikûmetê bi sînore. Bi derketina çeteyan û diyarbûna aliyên kêşeya kurd yê civakî û çandî re, artêş jî bi xwe hesiya. Di rojên pêşîya me de wê kêşeya kurdî bê çareser kirin."

Prof. Dr. Kaynak, ji bo egerên van rûdanan jî, bal kişand ser şertên hundirîn û wiha peyivî: "Bi nêrîna min, bi zordariyê hêzên navxweyî helwesta hikûmetê guherî. Wekî faktorên derveyî jî, bi bir û bawerîya min, di navbera

DYA (ABD)' yê û artêşa tirk de, lihevhatineke ku çareserîya kêşeya kurd hêsantir dike, pêk hat."

Endamê Lijneya Rêveberîya Komela Mafên Mirovan Turgay Kaya, bi awayekî taybet bal kişand ser nizamnameya "Navendiya Birêvebirina Krîzan ya Serokwezîriyê" û da zanîn ku gelekî girîng e, belam bala raya giştî bi awayekî têr nekişandiye. Ev nizamname, di rastiya xwe de li dijî dijberîya (muxalefeta) kurd û civakî hatiye amadekirin û tê wateya birêveberîyeke ne-asayî ya timî. Ji ber vî yekê daxuyaniyên dawî yê rayedarên dewletê ne ji dil in û bandora vî nizamnameyê roj bi roj wê zêdetir bibe. Kaya axaftina xwe wiha domand: "Serlêdanên îşkenceyên sistematîk, kuştinên bêdarezandin û windayên her diçe zêdetir dibin. Ji ber vî yekê daxuyaniyên dawî ne ji dil in. Her wiha gava ku dewlet di qada navneteweyî de pêrgî zordariyanê tê, ji bo ku dilê raya giştî ya cîhanê xweş bike daxuyaniyên wisa dide." Kaya, her wiha bal kişand ser bixwehesîna raya giştî ya piştî bûyera Susurlukê û daxuyand ku bandora vî yekê jî bandor li dewletê kiriyê.

Endamê Lijneya Rêveberîya IHD'ê Turgay Kaya, der barê polîtîkayên welatên Ewrûpî yê li hemberî kêşeya kurd de jî bal kişand ser durûtiya dewletên ewrûpî û da zanîn ku helwesta wan li gorî berjewendiyên wan diguhere. Kaya axaftina xwe wiha bi dawî anî. "Dema ku welatên ewrûpî jî bo çareserbûna kêşeya kurd û mafên mirovan zore didin dewleta Tirkiyeyê, desthilatdarên tirk îhaleyên gewre (mezînan) didin wan û bazara wan firehtir dikin. Piştî vî yekê daxwazên welatên ewrûpiyan heza xwe wînda dikin û navber didin daxwazên xwe. Ji layekî din ve, têkoşîna gelê kurd ya ji bo çarenûsa xwe jî bandorê li welatên Ewrûpî dike, divê ev bê dîtin. Belam, divê em durûtiya welatên ewrûpî hiç jî bîr nekin."

MAZLUM DOĞAN



Bangek ji xwendevanan re

Ziman, neynika neteweyê ye. Ziman bi hebûna neteweyekê ve ew qas girêdayî ye bi gotineke mamostayekî frensî ku ji dîrokê re bûye mal û di literatura cîhanê de cih girtiye giringiya ziman xweş xuya dibe.

Hevalno, ji ber ku rewşa gelê me pir-hindik ji we jî kişî e, ne hewce ye ku ez bi dorfirehî li ser rawestim. Ger em li malbata neteweyên cîhanê hinekî çav lê bigerin, wê rewşa me bi rengê zelal bê xuyakirin.

Bi ya min, gelek netewe yên cîhanê zaningeh kuta kirine, lê em hîn nû dest bi fêrbûna alfabayê dikin. Li gorî endamên malbata neteweyên cîhanê em hîn li dewra zarokatiyê ne û me hîn nû qeyda xwe li dibistana seretayî çêkiriye û me dest bi xwendin û nivîsandinê kiriye. Karê me giran e. Ji bo ku em xwe bigihînin neteweyên din û li nav malbata cîhanê xwedî cihê bi rûmet bin, pêwist e ku em çar saetan razên, çar saetan bêhna xwe vedin û şanzdeh saetan jî bixebitin. Belê, pêwist e ku em berê xwe bidin armanceke bi qandî çiyayê Agirî bilind û ber bi wê armancê ve bi dilovanî, bi evîndarî û bi hezkirin baz bidin. Ev li aliyekî.

Hevalno, wekî hûn jî dizanin, gelê kurd bi lez ber bi tarîbûnê û nemanê ve diçû. Bi saya lehengên nemir, bi saya zarokên jêhatî ên ku ji nava gelê me derketin, di zulfûmata şevê de zayîna gelawêjê pêk hat. Bi neynûkan, bi xwinê, bi xwedanê em gihîştin van rojan. Dema em ber bi mirinê ve diçûn, zimanê me yê ku ji kûrahiya dîrokê dihat ber sekeratê. Va ye, li vê demê, li ber ronîya agirê gelawêjê rojnameya Welat za û bû melhemeke Hekîmê Loqman ji bo ziman. Welat, di vê pêvajoya kirîtik de mîsyoneke girîng li xwe bar kir û niha jî bi Azadiya Welat, vê rola xwe bi serkeftî dilîze.

Hevalno, mîsyona Welat'an gelek bi nîrx, heja û girîng e. Binihêrin; Rojname û kovarên me ên ku di dîroka me de ta niha weşiyane, hema bêjin tevaya wan, yan li derveyî welat bûne û yan jî ne gihîştine gel, ango têkiliya wan û gel bi hev re tune bûye, ji bilî Welat ku îro li nav gel tene weşandin û têkiliya wan û gel jî ên din gelek xurtir e.

Ev yek, wateya ku Welat jî ên din cuda dike. Rûmet û payeyeke bilind dide wan. Ji ber ku Welat li nav gel e, di warê ziman, naskirina çand û pêzanîbûna dîrokê û di gelek warên din de gel perwerde dike. Di vê xalê de ez dixwazim hinekî behsa jiyana xwe bikim.

Serpêhatiya min

Ez sîh û sê salî me. Zimanê minî zikmakî ji zaravayên kurdî, kirdkî ye. Lê bi rastî ez wê jî gelekî hindik dizanim. Zaroktiya min li Dîlokê di nav tirkên de derbas bûbû û min dibistana pêşî li wê xwendibû, min ew kirdkiya xwe jî jibîrkiribû. Kurmancî jî min qet nedizani. Belkî peyvên mîna; tu çawa yî, baş î, çi dikî û çend peyvên din. A kurmanciya min ew qas bû. Lê di zimanê tirkî de min

xwe gelek gihîştandibû.

Ta derketina Welatan rewşa min ya jî aliyê zimên de ev bû. Ji aliyê din, ger yekî ji min bipîrsiya: "Tu kurd î? Minê bi gota, "Erê." Ger bigota: "Ka bi kurdî bi axive..." Bêrsiv tunebû û cara din bigota: "Lawo, ma tu çawa kurd î? Belkî tu ne kurd jî bi..." minê dest bi avêta çovê xwe. Lê rastî ew bû ku ez ne kurd bûm û ne jî yekî din. Ji ber ku min pir xweş bi tirkî zanibû, dibe ku ez tirk bûma jî.

A di vê demê de Welat gihîste hawara min. Pêşî tîp, dûv re peyv bi peyv, hevok bi hevok, paragraf bi paragraf. Car hebû min nivîsek deh, panzdeh caran li pey hev dixwend. Çavên min bi hesret li riya her hejmara Welat bû. Welat, Welatê Me û Azadiya Welat. Û ez jî îro gelek qenc û xweş bi kurmancî û bi kirdkî fêrbûme. Û ez îro dikarim her cûreyên nêrîn û ramanên xwe bi hêsanî bi zimanên kurdî binim zimên. Bi zimanê xwe diaxivim, diramim, dixwînim û dinivîsinim. Bi zimanê xwe helbestan dinivîsinim. Ka hela ji kerema xwe re li navê bini yê vê nivîsê binihêrin. Ez bawer dikim ku wê ev nav ji we re biyan neyê. Ev nivîsa min û helbestên min ên çendan in ku di Azadiya Welat de diweşin. Ez ne ji bo pesindaniyekê vî tiştî dibêjim, Ji bo ku bibe mînak û ji bo wateya Welatan jî bê fêmkirin, bi taybetî ez didim xuyakirin.

Ji her tiştî wêdetir, ger îro yek ji min bipirse: Tu endamê kîjan neteweyê yî? Belkî ji sedî pîncî û yek ez dikarim bêfedî bibêjim: Ez kurd im.

Tiştêkî din jî, min di warê axaftina kurdî de jî dîksiyona xwe bi pêş ve biriyê û sazkirina peyvên ku ji devê min derdê û telfûzkirina wan jî gelek bi pêş ve çûye. Ger îro li Amedê radyoyek an televîzyoneke ku bi kurdî weşanê bike hebe, ez ji niha ve amade me ku wekî axivger-sîpîker, an jî pêşkêşvanekî tê de cihê xwe bigirim. Ev hesreke min e. Hesreke min a din jî; ger ku Xwedê hez kir û ez ji xwe re fêrî soraniya me ya xweşik jî bûm, jixwe mirin emrê Xwedê ye.

Ziman dara fêkiyan e

Bi destpêkirina jiyana mirovahiye ziman jî dest bi jiyane kiriye. Berî wextan, ziman jî aliyê peyvyan ve kêmbûye. Bi pêşveçûyîna mirovahiye re ziman jî li gorî dema xwe bi pêş ve çûye, xurt bûye û jî aliyê peyvyan ve dewlemend bûye. Kesekî ji bo ku têkiliyên wî û civaka ku têde dijî xurt û qewî be, pêwist e zimanê wê civaka xwe gelek baş zanibe. Ziman, di jiyana mirov de girîngiya xwe di her demê de û di her warî de nîşan dide. Her neteweyek zimanekî xwe heye. Endamên wê neteweyê bi wî zimanî diaxivin. Jixwe ziman nîrxê neteweyî ye. Di Quran a Kerîm de jî Xwedê taala gotiye: "Çêkirina te (dirûvê te), qewmê ku tu jê-

yî û zimanê ku tu pê diaxivî, ev tev de diyariyên min in ji te re", tê xuyakirin ku bi rastî jî îro her neteweyek bi zimanekî diaxive.

Ziman zindî ye. Mirov dikare bişibîne dareke fêkiyan. Ger dareke mirov a fêkiyan hebe û mirov lê xwedîtiyê neke, lê miqate nebe, wê ew dar bi demê re hişk û pûç bibe. Lê na, ger mirov di germa havînê de av bide, biharan mirov axa dora wê mer bike, mirov guliyên wê çêke û ji sewalên kûvî û kurman biparêze wê dara mirov him fêkiyên xweş, mezin û gihîştî bide û him jî wê peygen wî xurt û pir bin ku zarokên mirov, neviyên mirov li germa havînê li bin siya wê tîr razên û bilizin.

Ziman, neynika neteweyê ye. Ziman bi hebûna neteweyekê ve ew qas girêdayî ye bi gotineke mamostayekî frensî ku ji dîrokê re bûye mal û di literatura cîhanê de cih girtiye giringiya ziman xweş xuya dibe. Dema ku leşkerên nazîyan, Fransayê dagir dikin, ew mamoste jî li dibistanê darsa zarokan dide. Dema di şîbakê re dinihêre ku wa ye dor li dibistanê jî hate girtin, wê demê dibêje: "Zarokno, dibe ku ev darsa me ya dawîn be, li zimanê xwe xwedîtiyê bikin, ger ziman hebe, netewe jî heye!"

Îro tevaya neteweyên li cîhanê jî bo ku xwedî li zimanê xwe derên, sazgeh ava kirine. Ev sazgeh bi şeweyeke zanistî-akademîk û bi profesyonelî dixebitin. Bo nimûne mirov dikare "Türk Dil Kurumu" a tirkan nîşan bide. Îro, ji her neteweyê zêdetir lazim e gelê kurd li zimanê xwe xwedîtiyê bike.

Êdî sazîyên me jî hene

Îro sazgehên kurd ên akademîk jî hatine damezrandin û di demeke kurt de gelek xebatên heja kirine û gelek mesafe jî girtine. Bi saya xebatên mirovên zana, rewşenbîr û hunermendên kurdan ku di bin banê van sazgehan de dixebitin, zimanekî kurdî yê nûjen û hemdem li ser bingeha xwe ya xurt û dewlemend hatiyê afirandin. Ji ber ku kurd bi zimanekî navendî, hevpar û yekgirtî napeyivin hew bi zimanê malbata xwe, an gundê xwe, an navçê û herêma xwe diaxivin, nikarin têkiliyên xurt û qewî bi hev re daynin. Heta, ew zimanê ku dizanin jî bi piranî jî bîr kirine. Ger biaxivin jî zimanekî tevî hev e; ne dişibe kurdî û ne jî tirkî. Kêzanzîbûna ziman bandoreke neyînî li tevaya jiyana mirov dike. Çawa ku ziman kêmbû û tevîheve e, fikir û ramanîna mirov jî tevî hev dibe. Kesekî ger jî zimanê xwe re serdest nebe, nikare xwe bi hêsanî ifade jî bike. Pirsgirêkên kesayetî di wî mirovî de dikarin bihêsanî cih bigirin. Her tim ew dikevin kompleksê daketî. Ji bo ku em karibin di nav civaka xwe de têkiliyên xurt û qewî bi hev re deynin, em ji hev bi hêsanî fêrî bikin, pêwist e ku em hemû fêrî ev zimanê ku îro pê tê nivîsandin, ev zimanê ku sazgehên kurdan afirandine bibin û di tevaya jiyana xwe de bi kar binin. Ev zimanê han (ger hinek kêmasiyên wî jî hebin), bi

a min ji her awayî ve bêrsivê dide dema me ya îroyîn û pêşeroja me jî.

Ew zimanê kurdî ku ji kûrahiya dîrokê ya hezar salan bi vir ve hatiye, li ser wî zimanî bi ya min, bi şeweyeke zanistî li ser xebat hatiyê kirin û hîn jî didome. Peyvên biyan bi piranî jê hatine neqandin, hatiyê pakijkirin. Peyvên nû û pêwist li ser hîmê zimanê kurdî hatine avakirin. Zimanekî dewlemend ku mirov karibe her cûreyên ramanan bi hêsanî bîne zimên, niha li ber me ye û li me çav dişkine û dibêje: Ez di bin emrê te de me.

Gelek rewşenbîr, hunermend û nivîskarên me hene; ji ber ku berhemên xwe ne bi zimanê me nivîsandine, îro bûne malê biyanan. Em jî wan bi şiddet rexne dikin, ji ber vê helwesta wan. Ger mirov navê wan bide, mîna; Nabî, C. Sureyya, Y. Kemal, A. Arif û hwd. Lê, ji aliyê din ve, îcar gelek nivîskar û rewşenbîrên me hene û bi zimanê kurdî berhemên diafirînin-diweşînin, lê em wan-naxwînin. Ger mirov destê xwe bide ser wîjandê xwe û hinekî bipûnîje wê rastiyê bibîne.

Sedemê nexwendina me jî kêzanzîbûna ziman e. Ji aliyê din ve, ji bilî ku em bi kurdî naxwînin û kêmbûna ziman, ewan rewşenbîrên gorbihuşt ku li dîroka me rêç hiştine, tu agahiya me li ser wan tune. Wekî; Ehmedê Xanî, Feqiyê teyran, Melayê Cizîrî, Cegerxwîn û gelek ên din. Belê, ger mirov vana nexwîne, nenase, wê çawa dîroka xwe, çanda xwe bi zanibe?

Metoda hînbûna ziman a herî pratîk çi ye?

Mirov, gerek e pêwistiya axiftina bi zimanê xwe gelek baş zanibe û jî zimanê xwe ji can û dil hez bike. Bibe evîndarê zimanê xwe. Ya dîtir jî, îro kes nikare bi hêsanî bibêje; zimanê me di bin qedexetiyan de ye. Welew hîn bi tevayî di pêvajoyê serbixwe de nebe jî. Ji bo xwendin, nivîsandin û axaftina bi kurdî mazeretên ew qas li cih tune ne. Ger îro, bi zimanê kurdî bi gelemperî nayê axaftin û ew nayê bikaranîn, ev yek kêmasiya me ye. Bi piranî jî ew kes û malbatên ku navê welatparêziyê li xwe dikin, hîn zêdetir tewanbar in. Ger jê bê pîrsin: Gelo çima tu bi kurdî napeyivî? Wê ji hezar newalan avê bikîşîne. Hinek jî dibêjin: De tişt nabe, wê welat rizgar bibe û wê her tişt bibe bi zimanê kurdî û emê jî wê demê mecbûr bi zimanê kurdî biaxivin. "Kalo nemir bihar tê, pîrê ne mir pincar tê".

Hevalno, ji bo ku mirov zimanekî kurdî yê zelal biaxive, pêwist e mirov bi rik û înat her tim û di her warê jiyana xwe ya rojane de kurdî bi kar bîne. Wan peyvên biyan (tirkî) ku di nav axaftina mirov de bin, gerek mirov wan jê derxe û di şûna wan de ên kurdî bi kar bîne. Yên ku nayên bira mirov jî, bi xwendina berhemên (kovar, pirtûk, rojname û hwd.) kurdî wê yeko yeko bi kevin tîrîkê mirov e peyvyan.

ROŞAN LEZGÎN

Dahûrîna peyvvan (11)

Wekî me berê jî dabû xu-yakirin, mebesta me jî dahûrandina peyvvan, naskirina peyvên me yên hevedudanî yên xerabûyî ne. Em lê dixebitin ku em hem jî aiyê morfoloji û hem jî, ji aliyê etimolojiyê ve koka wan eşkere bikin.

cinawir: Ev peyv me ya hevedudanî ku ketiye zimanê tirkî jî, di du hêmanan pêk tê. Her wiha, peyv ji eslê xwe dût ketiye. Hem ji hêla wate ve û hem jî ji hêla teşe ve. Em peyvê ji hev bikin û awayê wê yê rast pêşkêş bikin. Cînawir ji /cin/ û ji /awir/ê hatiye pê. Peyvê "cin" bi xwe "can" e. Di kurmançî de mirov bi hêsanî leqayî parkîtên wekî "awer", "awir", "war" û "wer" tê.

Di peyvê "cinawir" de parkît "awir" e, mîna "miz+awir". Em piçek li ser "cin"ê rawestin, çawa me di serî de jî eşkere kir, ew ango "cin" rewşa xerabûyî ya "can" e. Ev peyv (cin) di kurmançî de nola "gan" û "giyan" jî tê bilêvkirin.

Em der barê "gan" û "can" de jî hin agahiyan bidin. Her çiqas di kurmançî de rêjeya pevguherîna dengên /c/ û /g/yê kêm be jî, dîsa tê ditin ku ew her du deng bi hev diguherin.

Îcar em veşerî ser wateya peyvê. Îro ev peyv ji bo ajal û tebayên dirende,

nojek û pir gir tê bikaranîn. Her wiha bi heman (eynî) wateyê û bi şeweyê "canavar" ketiye zimanê tirkî. Lê di rastîya xwe de, wateya wê ya rast ev e: Tiştê bi can û giyan. Ji bo vê yekê peyvên mîna *giyanewer, candar, benderih û zîrih* tîna bikaranîn.

bablîsk: Ji sê hêmanan çêbûye û mirov rastî awayên wê yên wekî boblîsk, bablîsok, bobelîsk û balîsk jî tê. Em wê dahûrînin, peyv ji /ba/, /bi/, /lis/ û /k/yê

Cinawir, îro ev peyv ji bo ajal û tebayên dirende, nojek û pir gir tê bikaranîn. Her wiha bi eynî wateyê û bi şeweyê "canavar" ketiye zimanê tirkî. Lê wateya wê ya rast ev e: Tiştê bi can û giyan. Ji bo vê yekê peyvên mîna *giyanewer, candar, benderih û zîrih* tîna bikaranîn.

çêbûye. Ev dahûrîni ji bo van şeweyan jî ango *boblîsk, bablîsok, bobelîsk û balîsk* ê jî derbas dibe.

Peyvê /ba/ jixwe tê zanîn, /bi/ daçek e, /lis/ koka lêkera "listin"ê ye ku ji raweya fermanî hatiye bidestxistin, /k/ jî parkît e. Em wan hêmanan bînin rex hev: *ba+bi+lis+k*, yanê baya ku bi lis e. Em bi bîr bixin ku di kurmançî de gava çend hêman bêne cem hev û wisa peyveke nû çêbibe, parkîta /k/yê jî tê dawîya wê. Nimûne: *bin+cil+k, bin+kiras+k, ber+dil+k...*

tîroşk: Peyv ji sê hêmanan, ji /tîr/, /roj/ û /k/yê hatiye pê. Di kurmançî de em li şeweyên vê peyvê hevedudanî yên mîna "tîrişk", "tîroz" û "tîrêj" rast tîna. Îcar em bizivirin ser nimûneya xwe û bidin xu-yakirin ku bê çawa guherîna di peyvê de çêbûye: *tîr+oş+k*; di peyvê de /tîr/ teşeya xwe parastîye, /oş/ teşeya xwe neparastîye û halê xerabûyî ya /roj/ê ye, /k/ jî parkît e.

Ji ber ku di peyvê de du heb /t/ hati-

jîpiya...

Em dibêjin qey dabaş û mijara me ya li ser peyvê "tîroşk" zelal û ronî bû. Bêyî ku em ji bîr bikin, divê em diyar bikin ku "tîrişk", "tîroz" û "tîrêj" tev şeweyên xerabûyî yên peyvê hevedudanî ya "tîr+roj+k"ê ye.

mizgîn: Ev peyv hevedudanî ji du hêmanan pêk hatiye û ji layê teşeyê ve eslê xwe parastîye. Em wê ji hev bikin; ew ji /miz/ û parkîta /gîn/ê çêbûye.

Kurd peyveke din jî di heman wateyê de bi kar tînin; mijde. Ev jî hevedudanî ye, ji /mij/ û parkîta /de/yê hatiye pê. Her wiha /mij/ û /miz/ yek tişt e, tenê dengê /j/ û /z/yê bi hev guherîne.

Sedema ku me "mijde" hilda destê xwe ev e: Her du peyv ango "mizgîn" û "mijde" bi parkîten cuda, lê ji kokekê (mij an miz) hatiye çêkirin.

Parkîten /gîn/ û /de/ di kurmançî de xweş tîna ditin, mînak: *lez+gîn, xem+gîn, xwez+gîn; tal+de, xwen+de, diyar+de, qûn+de...*

Li aliyê din, dîsa ji /miz/ê peyv hatine çêkirin, wekî *miz+î* (ku tê maneya uca erebî), destmizî, mehmizî... Em di kurmançî de rastî van wateyên /miz/ê tîna: Çêj û tehma ku tê de tîrîşî, şîrîmî û şorî heye, gotina xweş.

ZANA FARQÎNÎ

Qedera Rojhilat û Kurdistan

FAYSAL DAĞLI



Cima devereke wekî Rojhilata Navîn û Kurdistanê, ku perçayek ji bihustê ne, niha bûne deverên lanetkirî? Ew welat çima ew qas sal e sehneyên şer in? Însanên herêmê çima barkêşên ew qas zulm û êşan in? Kurdistan çima koloniyê dawîn a li ser rûyê cihanê ye? Çima çar perçe ye? 35 milyon mirov bêwelat, bêmaf, bêziman in. Ereba çima 23 perçe ne? Sira vê qedere çî ye? Ev Rojhilat lanetkirî ye, çî ye? Mirov dema li ser van pirsan difikire tiştêk dertê hemberî mirov; dewlemendiya Rojhilat û Kurdistanê.

Belê, di trajediya kurdan û gelên herêmê de rola dewlemendiya kanên welatê wan heye. Zengîni li welatê cihanê dibe sebebê pêşveçûn û dilgeşiyê. Lê mixabin Rojhilat ku warekî bihustê ye û ser û binê axa wê seranser wekî çavkaniyên dewlemendiye ye, bûye wekî cografayêke lanetkirî. Dewlemendiya van welatan bûye qeda û trajediya wan. Ava çemên wan, bîrên petrola wan, darên çiyayên wan îro girêka stûyê wan in. Ew bûne qurbana dewlemendiya xwe. Em van gotinan, tenê di warê petrola herêmê de binirxînin û bersiva pirsên jorin bi reqeman û bi jiyane bidin!

Mirov kare bêje ku dîroka sedsala 20'an bi petrolê hat nivîsandin. Şerê ereban û Israîlê, OPEC, derbeya Musadîk, cuntayên Amerîkaya Latînî, şerê Îran û Iraqê, doza kurdî, CIA,

Kisinger, Aramco, Shell, dagîrkirina Kuweytê, Saddam, Halepçe, Birakujî û gelek bûyer û qewmînen din, digerin, diherikin, cihên ku diçin kûrahîyên bîrên petrolê ne. Petrol; pere, hêz, kar, sîleh, tevger û her tişt e. Çavkaniyêke enerjîyê ye ku însan û eşya pê dijîn û hebûna xwe didomînin û di cihanê de enerjîya herî pêwîst û pir e. Heta niha jî tiştêkî ku cihê petrolê bigire nehatiye kişîkirin. Pêwîstiya petrolê di nav çavkaniyên enerjîyê de xwezayî de, ji %40'î zêdetir e. Di sala 1899'an de motora dîzel hat îcadkirin, di sala 1902'yan de motora balafîrê, di sala 1907'an de keştiyên ku bi motorên dîzel dixebitin ketin xizmetê. Bi vî awayî petrola ku heta wê demê tu qîmeta wê tune bû, ji bo pêşveçûna mirovahiyê bû çavkaniyêke stratejîk. Di van salan de dewletên ku rûyê erdê kontrol dikirin, Amerîka, Rûsya, Îngilîz, Fransîz û Almanya bûn. Petrol li Amerîka û li Rûsya hebû. Lê li ser axa Almanya, Îngilîstanê û Fransayê petrol tune bû. Pîspor û zanyarên wê demê tesbît kiribûn ku ew mayî li Kurdistan û Îran heye. Ev agahî bû îşaret. Ji bo petrolê reqabeteke dijwar dest pê kir. Sultan Abdulhamîd piştî ku petrola Kurdistanê kişî bû, di sala 1908'an de devera Kerkûk û Mûsilê li ser xwe tapû kir.

Di vê pêvajoyê de petrol yekemîn car li Rojhilat, di sala 1908'an de li Îranê hat derxistin. Bîra dîyemîn li Kurdistanê di sala 1927'an de li Kurdistanê Iraqê hat kolandin. Ev zêrê reş ku ji axa kurdan derket, qedera van deveran jî guhart. Piştî Şerê Cihanê yê Yekemîn, Kurdistan û hemû Rojhilata Navîn ket bin destê Îngilîzan. Wezareta Derva a Îngilîstanê siyaseta xwe ya Rojhilata Navîn li gorî petrolê danîn. Li gorî vê siyasetê, ev herêm wê her dem bibe qada şer û probleman. Ji bo ku Îngilîz karibin her gav destê

xwe tîxin nav karê gelê herêmê. Ji bo vê yekê ev plan hat çêkirin. Ereba di nav çend malbat, emîr û şexan de hatin parkirin ji bo ku sibê negihên hev û nebin tehlîkeyeke mezîn û damarên petrola xwe ji şîretê û dewletên Ewropa û Amerîka nebin, bi şeklê 23 dewletî ji hev hatin qetandin. Ji her şexekî û ji her mîreki, ji malbatekê re dewletek hatiye avakirin. Kurd ji ereban jî bêşanstir bûn. Ew jî di nav ereb, faris û tirkan de belav kirin. Yahûdî jî danîn kêleka ereban. Di nav ermenî, azêrî, tirk, ereb û farisan de jî, jixwe problem û nefretên kevn hebûn.

Halê hazir ew plana ku bi dehan sal berê ji aliyê komiserên siyasî yên Îngilîzan ve hat afirandin, hê jî di rojevê de ye. Dewletên herêmê tev dijmîne hev in. Belê gelê herêmê gostê hev dixwin, emperyalîzm jî dewlen:endiya wan.

Em bi çend gotin û reqeman rewşa Rojhilata Navîn, pêwîstiya wê û petrolê bînin ber çavan. Rezerweyên petrola cihanê jî sedî 66 li Rojhilat e. Dîsa hilberîna cihanê jî sedî 60 li vê herêmê tê kirin. Rezerweyên Amerîka û Ewropa wê di nava 10-15 salan de ziwa bibin, lê yên Rojhilat heta zêdetirî 90 salê din jî wê ziwa nebin. Welatên ereban bi tenê di navabera salên 1973 û 1981'ê de ji petrola xwe 350 milyar dolar kar kirin. Dîsa di sala 1989'an de di bankayên Ewropa û Amerîkayê de 670 milyar dolar pereyên ereban razandî bûn. Di van salan de ereban ji hatina xwe, ji %40 li kirîna sîlehan, ji %23 jî ji bo pêşveçûna welatên xwe xerc kirine.

Ew tablo ya dewlemendiya dewletên ereb di rûyê xwe yê din jî bîdadî û xizanî vedîşere Dewletên Kendawê bi 15.700 dolarî dijîn.

Newroz bibe hêviyêke pîroz!

Dîroka nezdî ra di şoreşgerî

Mayê qet Yılmaz Uzunî xwî vîra nekerê

Qandê Rojnamê a Özgür Gündemî ez şiyabiya Adna, sera neway û didin bî. Ze mi balî embazî newe newe bû rojnameyê gerweyayê. Îna ra jew jî Hikmet Tüysüz bî. Embaz Hikmet newe zindan ra viciya bî. O jî ze mi sûka Sivreg ra yo. Embaz Hikmet wexto ki tepişiya bî jî dirbetin bî. Qereqolandi û Zindanê Amedî di bol eziyet dibî. Ay ra serreyê ci, destê ci, lingê ci nîmê nîmê mane bî.

Ma çend korî ameyê pê hetek, qondê ke rojname a Özgür Gündem bigerweyo. Çend roja tepya Embaz Hikmetî marê vat: "Beno.. Eza rojname de bigerweya. Şima zane ke ez nîmê merdima. Karo ke ez bikêra wa şenik bo..." Ma va kare esto, ti vojê ki Qandê to viraziyeyo. Ey vat: "Çiçi yo." Ma vat: "Kamera yo embaz." O çax embaz Hikmetî ma rê vat: "Zek şima vanê beno, fina jî ez bewna na kamera, çi babêt a." Ma embaz berd kamerî hetek. Ey Finê wewna cîhazî, finê jî wewna ma û vat: "La no bal komple wo, eza senî nay ra fahm bikera." Vatîşê xwî tepya jî hewa.

Ma wewna kefê ey cado. Embaz çend roja miyan de bî operatorê kamerî. A rojan de Yılmaz Uzun zindan ra vijiya bî. Û amebî Adna. Yılmaz Uzun bol ve-

rî ra embazê Hikmet Tüysüzî bî. Kuçê sûka Sivregî de, Zindanê Amedî de piya bol çî kerdbî. Ayrı arê inan de aw nêaverdê.

Yılmaz Uzun a rojan de ame rojname a Özgür Gündemî. Sebebê ziyaretê ci Hikmet Tüysüz bî. Sifte ma hal û xatirê pê pêrs kerdî. Ma finê ra wewna Yılmaz Uzunî vat: "La oxil Hikmet tiyê nika çi kar kenê?" Embaz Hikmetî destê embaz Yılmazî tepişî û berd odê tarî, vat: "Bew, bew Yılmaz kamera a na cîhaza. To diya senîna?" Embaz Yılmaz çöşmê kamerî ra finê di finî şî ame, tenekê him him kerd û vat: "La oxil tiyê nika nay ra fahm kenê.." Embaz Hikmet zek xwî pîze ra vat: "Eee, qey ke baba meslegi yo;" embaz Yılmazî no fin vat "şo kardê xwî oxil; piye to nezanyê şiro çarwa vero. Kotîra vijya no 'baba meslegi!' La na ze 'uzay aracı' yo! Wamayî ne rojnamevana ti kerdê film..."

Na dialoga tepya ma berpe winî hewayî kê Zingânî kewt zerê odî a tarî.

Yılmaz Uzun bado şî gerîla. Rojê ma pahesiya ke o û panc embazanê xwî sûka Silopî de şehîd kewto. Dijmin qira embaz Yılmazî bi kardî a saxî ci kenê. Wexto ki embaz Yılmazî ci kerê, o qîreno îna sero û vano: "Kahrolsun sömürgecilik!" Ze zeredê Zindanê Amedî.

ZÜLKÜF KIŞANAK



Lacê Adirî embaz Derwiş

Taynî embazê ma estê, gerek e ma îna qe vîrî nekerê. Îna ra jew jî Derwiş Kurt bî.

Embaz Derwişa ma piya serê newana de li sûka Stenbolî di yurda AÖS piya manayê. Ey Unîversîta Stanbolî de Fakûlta Arkeologî de wanayê. O jî ze ma heme Kurdistan ra amebî. La belê embaz Derwiş ciwanekî sûka Gergera bî.

Yûrdî miyan de rojê ma raştê piya ameyê. Ey destandî jû rojnameya tirkî est bî. Mi wewna ki oyo hewayno û yeno vera ce ra. Mi veynda ey û mi

vat: "Embaz fina tiyê heweynê, sê biyo?"

Embaz Derwiş ageyra mi û vat:

"Embaz ma ez, senî nehewa, na rojnameyê çîye ke esto, ti biwanê tiye jî ze mi bihewayê. Keçê Adirî fina Dêrsim de helikopterê îna dayo herd ro!!

Mi va îna se vato. Embaz Derwiş fina hewa û vat:

"Îna! Îna vanê helikopter guhayo telê elektrîk ra û kewto. Na senî helikoptera ke zinciya xwî dano telanê elektrîk ra, embaz girwe nîna pak ra zûriyo. Dijmin her roja ravêrêna vinî keno, gerîlayê ma jî xurt beno. Nînan dîroka xwî zûriya sero berz kenê..."

Ey tepya mi fina va:

"Beno, beno embaz. Cerî welatî ma dest ra wo, an cî corî welatî tirka dest ra wo, înan ey ra vanê. Merdêka telanê elektrîkê xwî hezar di hezar metre cora çekenê. Helikoptera îna jî zaf feşî hezar di hezar metre şeno hawara şiro..."

Senî mi winî vat, embaz Derwiş ageyra û vat:

"Embaz no bî. Mi nezanabî îna telê elektrîkanê xwî ezmana ra çekerdî..."

Embaz Derwiş serê tepya Botan de şehîd kewt. Mayê qet ey xwî vîra nekerê.. Çimkî o bî Lacê Adirî...

ZÜLKÜF KIŞANAK

Newroz û rebeniya tirkan

Di van rojên ku rojeva çape-meniya tirk bi "tecawîz û tecawîzkar" hatiye dagirtin de, gelê kurd cejna xwe ya neteweyî pîroz dike. Rayedarên tirk li şûna ku werin ser riya heqî û biratiyê, îcar dest avêtin asîmîlekîrîna Newrozê. Yê nizanibe wê bibêje ew cejn ji bav û kalê wan maye. Li ser Newrozê fermannameya diweşînin, hewl didin ku gelê tirk jî bikin hevparê nîjadperestiya xwe. Dema mirov vê rewşê dibîne, dilê mirov bi tirkan dişewite û gotina Karl Marks a bi rengê "Neteweya ku zilmê li neteweyêke din bike, nikare azad bîjî" tê bîra mirov. Rebenên tirk piştî ev qas salî bihistin ku cejneke wan bi navê "Nevrûz" heye.

Hinek qelemşorên tirk ji bo ku Newrozê bikin cejna tirkan, çî ji destê wan tê dikin. Lê hinek jî vê rewşê napejirînin. Bo nimûne Murat Belge di nivîsa xwe ya Rojnameya Radikalê de, dixwaze ku dewlet akêbûna Newrozê neke mijara şer û pevçûnê. Belge dibêje: "Ger Newroz cejna kurd be jî, çima em jî vê cejnê digel wan bi dilekî xweş pîroz nekin?"

Li aliyê din nûçevana Turkish Daily Newsê Gül Demir li ser vê mijarê nivîseke balkêş nivîsiye. Demir kirina dewletê wekî karekî komîk bi nav dike. Rojnameger Demir dibêje: "Cejneke ku bi hezar salan e li gelek welatên cîhanê tê pîrozkirin, li ber çavê her kesî tê tirk-kirin." Rojnamegera tirk dide zanîn ku dewlet vê cejnê dike hacetê şovenîzmê. Pişt re jî ew dibêje: "Eger yek ji wan bipirse 'hûn çawa tirk in ku hûn tarîxa derketina ji Ergenekonê, ji kurdan hîn dibin?' ewê çî bersivê bidin?"

Gül Demir bi bîr dixwe ku dewlet ne tenê Newrozê dike malê tirkan, her wiha li rengên kesk û sor û zer jî xwedî derdikeve. Rojnamevan Gül Demir ji Tansu Çillera ku wê ji bo Newrozê here Îdirê, dixwaze ku Meraî Akşenerê jî bi xwe re bibe. Lewre ew li nav Ülkücüyan wekî "Asena" tê nasîn. Pişt re jî dibêje: "Dema hûn xwe di ser agir re çeng dikin, hay ji dawa-xwe hebin, bila agir bi dawa we nekeve." Gül Demirê di dawîya nivîsê de jî daye xuyakirin ku ewê li Stenbolê beşdarî pîrozbahiya Newrozê bibe.

S. MIRDÊSÎ



● 30.03.1972: Rêberê THKP/C Mahir Çayan û hevalên wî li Kızıldere yê hatin kuştin. Di sala 1972'yan de xwendekarên zanîngehan li dijî dewleta tirk têkoşînek kirin û di vê têkoşînê de 3-4 rêxistinên veşartî ava kirin. Yek ji van rêxistinanan THKP/C bû. Serokê vê rêxistinê Mahir Çayan, piştî ku ji Girtîgeha Maltepeyê reviya. Li Tokatê tevî hevalên xwe dest bi şerê çekdarî kir. Piştî girtina Deniz Gezmiş û hevalên wî; ji bo ku rê li ber dardekirina wan bigirin, Mahîr û 9 hevalên xwe 3 teknisyenên îngilîz revandin. Mahîr û hevalên wî û bi sê teknisyenên îngilîz ve li Kızıldereya Nîksara Tokatê ji aliyê dewletê ve hatin kuştin, bi tenê Ertuğrul Kürkçü bi saxî hate girtin.

● 30.03.1995: MED-TV li Îngîllistanê ava bû û dest bi weşana care-

bandinê (test) kir. Piştî demekê jî dest bi weşana asayî kir: Di 2'yê tîrmeha 1995'an de hate girtin. Piştî 45 rojan, di 15'ê gelawêjê de dîsa dest bi weşanê kir.

● 30 Adar: Roja bîranîna Şehîdên Kurdistanê.

Di meha adarê de, kesên wekî Mazlum Doğan, Mahsum Korkmaz, Zekiye Alkan, Raşan Demirel, Ronahî, Bêrivan, Qazî Muhemed, ji bo Kurdistanê serbixwe û azad şehîd bûne û gelek kesên din di rêça wan de serî danîne. Ev roj wekî 'Roja Şehîdên Kurdistanê' tê pîrozkirin.

● 2.04.1983: M. Karasungur û Ibrahim Bilgin hatin qetilkirin.

AWIR

Mînakî ji xwarinên



Li saziyên kurdan her ku çalakiyek tê pêkanîn girîngiya saziyan baştir xuya dibe. Di folkora kurdan de her wekî mûzîk, listikên kurdî, çîrok û zargotina kurdî, xwarinên kurdî jî hene.

NÇM ya Stenbolê roja 21'ê adarê çalakiyek bi navê "mînakî ji xwarinên kurdî yê kevneşopî" li dar xist. Ev çalakiya ev 5 meh e ku bi awayekî rêk û pêk ji aliyê Yekîtiya Malbatên Mezopotamyayê ve tê domandin. Ew her carê ji bajarên Kurdistanê ji bo nimûne, sê-çar xwarinan çêdikin û pêşkêşî mêvanên xwe dikin. Îcar jî, Yekîtiya Malbatên Mezopotamyayê ji Kurdistanê sê cure xwarin çêkirin. Navê van, mehîr, çigê goşt (çigê köfte) û zirfet (gomme) a Dêrsimê ne.

Ji Yekîtiya Malbatên Rûken, li ser çêkirin û bingeha van xwarinên kurdî ev agahî dan me: Çigê goşt (çigê köfte): Rûken xanim daxuyand ku, jêderka çigê goşt bajarê Kurdistanê Ruha ye û got ku, ev xwarin ku ji savar û goştê hûrkirî tê çêkirin, ji savar û hêka qelandî jî çêdibe; her wiha jinên kurdan, gava ku mîrê wan ne li mal bûya, ev xwarin ji savarê hûr çêdikin ji ber wê yekê navê savarê hûr "mîr ne li mal" e û ji bo çêkirina wê wisa got: Pêşî savara 'mîr ne li mal' tê nermkirin û goştê hûr (yan jî ji bedêla goştê hêka qelandî) vala dikin ser û baş tê lihevixistin û eciqandin; bi dû re bi rêzê rûn, pîvaza şîn û ya hişk a hûrkirî û beherat ber didin ser û li hev dixin û çigê goşt amade dibe.

Zirfeta Dêrsimê: Rûken, ji bo vê xwarinê wisa em agahdar kirin û got ku; ji bo nafka borekê; pîvaz, dendikê bêqaşil (dendik bi sîrkut tene hûrkirin) û qeliya goşt. Awayê çêkirinê: Pêşî pîvaz tevî rûn tê qelandin û qeliyê berî ser didin; paşê di

nav nanê sêlê de rast dikin û 5 qet li ser hev datînin û dikin firinê; çêbûna wê texmînê 20 deqeyan dom dike.

Piştî ku ev agahî dan me Rûken xanim got: "Berê firin mirin tunebûn me xwarinên wisa li ser pêta êgir çêdikin û tama wan jî pir xweş bû. Gava ku agirê tenûrê vedimirî (dibihurî), pilingê wî derdixistin, dixistin menqelê û xwarin di hundurê dîzan de (firaxên ku ji axê hatine çêkirin) li ser pêta êgir çêdikin." Rûken xanim bi bîr xist ku; jinên kurd ew qas bi huner, jêhatî û afirîner in ku, li ser pêta agirê tenûrê bi (eynî agirî) hem xwarin çêdikin, hem jî ava ser şuştin û kinc şuştinê germ dikirin; û got ku tirk nikarin van xwarinan bikin ên xwe, çimkî wekî ku eşkere ye bingeha van xwarinan Kurdistan bi xwe ye.

Piştî van agahiyan Rûken xanimê got: "Em niha ji ber zilm û kotekiya dewleta tirk hatine Stenbolê, lê belê xwarina ku me li welatê xwe dixwar li vir bi dest me nakeve. Li vir tiştên ji bo şînehiyê, kernebehar û du sê tiştên din hene, lê belê em li welatê xwe birçî nedibûn; ji berdêla kernebehara wan, tîzmask, tolik kereng, karî (kardî) û gelek tiştên ku navê wan nayên bîra min, hebûn; ev xwarin wekî ku bi wîtamîna xwe hêjaytir bûn, bêpere bûn jî." Di dawiya axaftina xwe de wê keserek veda û got: "Çavê min li xwarinên welatê min û li pincarê çiyayên Kurdistanê digere. Piştî re jî da zanîn ku dewletê ewqas ew asimilê kirine ku navê pir xwarinên xwe ew nikarin bi kurmançî bibêjin.

SEVDA ELDEMİR

ÇAVDÊRÎ

AMED TÎGRÎS



Cinawirên gerekstêrkî

Dema mirov li medyaya Tirkîyeyê temaşê dike an jî dixwîne, mirov matmayî dimîne û dibêje ev çawa welat e û çî mîlet e? Mirov li axaftinên serokkoma, serokwezîr, çigîra serokwezîr, wezîr û serokên eskeriyê û muxalefête guhdarî dike, wê demê mirov dibêje qey ew ne li ser rûyê dinyayê ne, li ser rûyê hîv, an jî gerekstêrkî (gezegenan) dijîn. Na, wela mirov dibêje qey ji cinawirên gerekstêrkî ne û ji wir hatine li Tirkîyeyê bi cih bûne û bûne serok!

Baş e, em bibêjin ev serokên wan ên sîvîl û eskerî ji hîvê an jî ji gerekstêrkî hatine û li welatê Tirkîyeyê bi cih bûne, ma gelê wê? Bi Xwedê dibe ku ew jî ji gerekstêrkeke din bin. Hem jî ji yeke dûr, wekî Platon, Nepton, Satûrn...

Heger wiha nebe, serokên wan li nav çavên wan mêze dikin û li ser lingekî hezar derewan li ser hev û li dûv hev dikin. Hem jî derewên bi çocîk û bi qemçîk. Ne carek-ducar, ne salek-du sal, tam 40-50 sal li ser hev û li dûv hev. Mirov eynî mirov, partî eynî partî û derew jî eynî derew. Süleyman Demirel, Bülent Ecevit, Alpaslan Türkeş, Necmettin Erbakan û malbata Înönü... Di dema van serokên gerekstêrkî de, du-sê nîfş (nesil) derbas bûn. Bav mir, law kal bû, niha nevi mezin bûne. Hersê nîfş jî, ji eynî mirovan bi eynî çîrok an jî derewan hezar carî bihistine û heta her roj dibihîzin. Ne eciz dibin, ne diqehirin û ne jî li dijî derew, dek, dizî û talaniya wan derdikevin. Gelê tirk û kurd piranî birçî ne, tazî ne. Ew li meydanan-alîyên partiyên van cinawirên gerekstêrkî hildidin û bi ser de jî, destên wan radimûsin û didin eniya xwe. Bi qîrîn dibêjin: "Xwedê we li serê me kême neke!..."

Ji derî amînê mirov çî bibêje? Hem jî hezar carî amîn!.. Înşelâh heta dinya hebe, dê ew li serê we kême nebin!

Em ne li hinek dewletên Ewropayê, em li hinek dewletên Afrîkayê binêrin; dema zamek an jî giraniyek çêdibe, gel serî hildide û dikeve cade û kolanan. Di dawiyê de dewlet mecbûr dimîne û bi paş ve gav davêje. Li Ewropayê di rewşên wiha de hikûmet îstîfa dikin an jî dikevin. Lê li Tirkîyeyê çî dibe?

Serokwezîrê wan her roj derdikeve ser televîzyonê, li nav çavên 70 milyonî mêze dike û dibêje; "Em hikûmeta dayîne ne, ne ya standinê. Em maes û destmiza memûr û karkeran zêde dikin û zemê nayînin ser tu tiştî..." Û roja din zêm tê ser her tiştî. Hem jî her hefte zem li ser zemê... Lê dîsa jî, ev gel ji wan re çepikan lê dide û destên wan radimise...

Gotineke pêşiyên me kurdan heye: "Pêşî şujînê di xwe re bike û piştê derziyê di hevalên xwe re." Ji vê rewşê divê em kurd ne carek û ne du car, hezar carî şerm bikin. Rewşa me hîn ji ya tirkî xerabtir e. Em wekî netewe koleyên serok û rejîmên wiha kole û kevnepereşt in. Mirin ji halê me kurdan çêtir e.

Pêwîst e ku em baş bifikirin û rabin ser piyan. Li xwe vegevin. Em ne ji gerekstêrkî û ne jî, ji Mogolistanê nehatine vî welatî. em gelê kevî Mezopotamyayê ne û ji hezar salan ve li ser axa bav û kalê xwe ne. Bes e êdî divê em guhdariya van dînazor û cinawirên gerekstêrkî nekin. Tu carî rê nedin ku ew li ser rindî û şerefa welatê me bilîzin. Bila di nav dewlemendiya welatê me de li ser rindî û şerefa welatê me nelîzin. Bila di nav dewlemendiya welatê me de negevizin!



YAKUP BILGE

Gelê kurd bi têkoşîna xwe ne tenê derdora xwe bi doza xwe hesand, her wiha derdora xwe jî baştir nas kir. Di gel vê yekê gelên cîran, bi taybetî yên kurdistanî jî li gorî nêrîneke nû tên nirxandin. Mirovên ku di çavên wan de bi tenê 'file' bûn, êdî xwediyê nasnameyeke din in. Gelê kurd ne tenê di gotinê de her wiha bi pratîka xwe jî piştevaniya gelên kurdistanî dike. Gelê suryanî yek ji van gelan e. Mamoste HASAN ZINAR bi nivîskarê suryanî Yakup Bilge re li ser dîrok û rewşa gelê suryanî hevpeyvînek pêk anî. Gotinên wî jî vê rewşê diselmînin (îspat dikin).

Berê suryanî jî bo kurdan bi tenê file bûn, îro gel in

Birêz Yakup Bilge, hûn dikarin xwe bi xwendevanên me bidin nasîn?

● Ez sala 1965'an li Midyada Mêrdînê hatime rûyê dinê. Di sala 1987'an de, min Unîversîteya Stenbolê Beşa Têkiliyên Navnetewî kuta kir. Di sala 1990'an de, min teza xwe ya lîsansa bilind derbarê suryanîyan de pêşkêş kir û hate pejirandin. Piştî sala 1992'an bi dorê, di rojnâmeya Hürriyet, Cumhuriyet û Yeni Yüzyılê de xebitîm. Niha jî ez di Yeni Yüzyılê de dixebitîm. Heman wext jî li Unîversîteya Stenbolê, di Beşa Têkiliyên Navneteweyî de xebatên doktorayê pêk tînim. Min teza ku ji bo lîsansa bilind amade kiribû, hinekî bêtir dorfireh kir û wekî pirtûk, bi navê; Süryaniler: Anadolunun Solan Rengi, (Rengê Anatolê yê Çilmîsî: Suryanî) di nav weşanên Yeni Yüzyılê de hate çapkirin.

Bi qasî ku em dizanin, di heyama şerê cihanê yê yekemîn, di nav tixûbê Tirkiyeyê de bi sedhezaran suryanî dijiyan. Îro tê gotin ku li dora panzdeh hezar suryanî dijîn. Çi bû, çawa bû, sedemên van siyasatên ku gelekê kevînar ji ser xaka wan kire der çî ne?

● Di arşîvên Osmanîyan û nivîskên

(belge) wê heyamê de, hejmara suryanîyan ku li der û dora wan, Culemêrg, Riha, Edene, Amed û Mêrdînê niştecih bûn, bi qasî 400 hezarî tê xuyakirin. Siyaseta hindikahiyê ya dewleta Osmanî, sedema bîngehîn a ji holêrabûna suryanîyan e. Sedemek din jî ew e ku gelên herêmê ji aliyê serdestan ve hatine xebitandin û wan jî gelê suryanî qir kirinê. Qirkirina 1914-1915'an ya ku suryanî jê

Qirkirina 1914-1915'an ya ku suryanî jê re "Sayfo" (Sûr) dibêjin, koka suryanîyan aniye. Tê gotin ku di vê qirkirinê de 180 hezar mirovên suryanî hatine qetilkirin. Yên ku mane jî hatine koçberkirin.

re "Sayfo" (Sûr) dibêjin, koka suryanîyan aniye.

Tê gotin ku di vê qirkirinê de 180 hezar mirovên suryanî hatine qetilkirin. Yên ku mane jî hatine koçberkirin. Bêşik ev politîkaya Osmanî, ji bo ku gel serxwebûna xwe nexwaze, dihat meşandin.

Alayên Hemîdî yên ku ji êlên (eşîr) kurdan dihatin pê, bi destê îktidarê hatibûn avakirin. Alayên Hemîdî di vê qirki-

rinê de wekî şîrik cih digirin. Koçberiya suryanîyan ya mezin û duyemîn, ji ber sedema şerê di navbera PKK'ê û hêzên ewlekariyê dest pê kir. Suryaniyên ku ji ber sedema şer ketine astengiyê, xelasiya xwe di koçberiyê de dîtin.

Suryaniyên ku li Stenbolê dijiyan jî bar kirin. Bêje hema hemû çûne Ewropayê. Ev yek jî dide diyarkirin ku sedemên koçberiya suryanîyan, gelşeke

(pirsgirêk) piralî û kûr e. Ew nikarin ji mafê xwe yê çandî, perwerdeyî û hwd. îstîfade bikin. Lewma berê xwe didin welatê xerîbiyê.

Gelê haya we ji rewşa aborî, çandî, civakî û komevanî ya gelê suryanî yê ku koçber bûye, heye?

● Suryaniyên ku ji Tirkiyeyê koçber bûne, li welatên wekî Holanda, Almanya û Swêdê dijîn. Li wan deveran bi qa-

sî ku maf tê dayîn çalakiyên civakî û çandî pêk tînin. Bo nimûne tu heyamê li Tirkiyeyê suryanî bi zîmanê zîkmakî perwerde nebûn. Lê li wan welatên ku niha lê dijîn, di dibistanên dewletê de fêrî zîmanê xwe û çanda xwe dibin. Ev yek ji bo wan pir girîng e. Ji hêlekê ve diyar dibe ku suryanî ev çend ji mafê xwe bêpar in. Suryaniyan, rêxistinên xwe yên siyasî jî, yekemîn car li van welatên biyanî ava kirin. Suryaniyên ku li ser xaka bav û kalê xwe li derveyî siyaseta mabûn, bi rêxistinên xwe yên siyasî û sîvîl dixwazin di civakê de cihê xwe bigirin.

Di pêvajoya dîrokî de gelê suryanî, bi gelên din re, nemaze bi gelê kurd re, bi çî awayî ketiye têkiliyê û bi çî rengî bandora wan li ser hevûdin çêbûye?

● Em dikarin bibêjin ku dîroka suryanîyan, dîroka qirkirinan e. Gelek caran ferman li wan rabûye û hatine qirkirin. Ji ber vê yekê, dîroka gelê suryanî bi ya gelên ku li Mezopotamyayê jiyane re ne haşt e ango li hev nake. Ev rewş hinekî ji bo kurdan jî wiha ye. Di pêvajoya dîrokî de gelek serdestên kurdan yên xwefirotî ji Osmanîyan re peyafî kirine.

Van nokeran gelê suryanî qir kiriye. Digel vê yekê, di navbera suryanî, kurdên êzîdî û kurdên din de dostaniyeke ji can û dil jî çêbûye. Hinek kurdan serê suryaniyan jê dikir, lê hinekan jî ew parastine, ew jî lepên zaliman xelas kirine. Têkiliyên olî di navbera suryanî û êzîdiyan de jî balkêş in. Êzîdiyên ku Osamanî li wan hatine xezebê, xwe li patrikên suryaniyan girtine.

Van salên dawîn di navbera gelê Suryanî, nemaze di navbera ronakbîrên suryanî ên ku li Ewropayê dijîn, gengeşiyek (nîqaş) der barê binyada gelê Suryanî de dest pê kiriye. Vê gengeşiyê bi xwe re pirsê "asurî, suryanî, aramî" çiyê, kî ne, derxiste holê. Hûn dikarin vê gelşê ji me re şirove bikin?

● Ev gengeşe, çalakiyeke hundirîn a di navbera gelê suryanî (asûrî) de ye. Gelê ku li Tirkîyeyê bi navê suryanî tê nasîn, li Iraqê bi navê asûrî têne nasîn. Dîroknasên rojavayî jî bi navê asûrî vî gelî dinasin. Ronakbîrên ku koçberî Ewropayê bûne, rêxistinên siyasî ên nû damezirandin. Di vê pêvajoyê de xwestin ku ji serî ve dîroka asûriyan dahûrînin (analîz bikin). Gihîştin bawerîya ku ji suryaniyan re asûrî were gotin çaktir e. Biryar li ser peyva "asûrî" hate dayîn. Lê pişt re komek ronakbîr rabû got ku, ev dîtî çewt e. Ev koma duyemîn li gorî ya pêşîn paşverûtir e. Li hemberî peyva "asûrî" derketin. Ev nîqaş hinekî jî bir û bawerîya polîtîk a cihêreng tê. Yê ku nêzî xeta çep in, peyva "asûrî", yê ku nêzî xeta kevneperest in, peyva "suryanî" û hin caran jî peyva "aramî" bi kar ûnin. Bes vê dema dawîn, ev gengeşe hinekî sar bû û wê bandora xwe winda kir. Îro, rêxistinên ku van peyvan hemûyan jî dipejirînin hatine damezirandin. Êdî gel jî vê nîqaşê di cihê xwe de nabîne.

Ez bawer im ku raya giştî der barê hêjayiyên folklorîk ên devkî û nivîskî de zêde ne agahdar e. Hûn dikarin hinek agahiyan pêşkêş bikin?

● Çi heyf û mixabin ku ronakbîrên Tirkîyeyê û Unîversîteyên wê gelên ku



di vê erdnîgariyê (coğrafya) de jiyane înkâr kirine. Ji bilî bîr û bawerîya fermî, tu dîtineke wan çênebûye.

Her wiha raya giştî jî dewlemendî û hêjayiyên gelên ku bi wan re jiyane nikare bibîne.

Şaristaniyeke (medeniyet) suryaniyan ya pênc hezar salî heye. Şaristaniyek rengîn û dewlemend e. Ev gel xwe-diyê kevneşopa nivîsê ya pir xurt e.

Heta sedsala 14'an, edebiyata suryaniyan pir zinde bû. Heta vê demê bi hezaran berhemên ku bi zimanê suryanî hatine nivîsîn, hene. Bi hezaran pirtûkên lawîj, felsefe zimanzanîn, hiqûqa dêrê, olzanîn û bijûnî ya orjînal hatibûn nivîsîn. Wekî din, di serdema kevnar de gelek berhemên grekî ên klasîk hatine wergerandin. Ev nivîsar bi alîkariya wan wergeran heta îro hatine. Heke pêşkêti-na zanistî di nav ereban de hebe, ew jî bi saya van wergeran e ku ji grekî derbasî

suryanî, ji wê jî derbasî erebî bûne. Şîrên ku bi suryanî hatine nivîsîn, hêj jî dermeketine ber tavê. Di dema filetiyê ya pêşîn de, gelek nivîsar hatine nivîsîn ku îro bala Unîversîteyên Rojava dikşînin ser zimanê suryanî.

Rewşa îroyîn ya suryaniyên ku di nav sînorê Tirkîyeyê de dijîn çawa ye? Di warê civakî û çandî de tu pêşveçûn hene?

● Îro gelek gelşên civakî û çandî yê suryaniyên ku li welêt û Tirkîyeyê dijîn hene. Peymana Lozanê "Statûya hindîkayî"yê neda suryaniyan. Wekî ku tê zanîn ev statû ji ermeniyan, rûman û ji cihûyan re hate dayîn. Lewma, dibistanên suryaniyan ên ku ziman û çandê hîn dikin tune ne. Ji ber van sedeman ciwanên me yê ku li Stenbolê dijîn, nikarin bi zimanê xwe biaxivin. Bi gelemperî, civata suryaniyan, nikare bi Suryanî bini-

vîse û bixwîne. Bêşik digel zimên, tore û kelepore suryaniyan jî hêdî hêdî ji holê radibe.

Têkoşîna tevgera azadiyê ya Kurdistanê, bandoreke bi çî awayî li ser suryaniyan çêkir?

● Wekî ku min berî niha jî gotibû, şerê ku di navbera PKK û hêzên ewlekariyê de çêdibe, dibe sedem ku suryanî têkevin astengîyan. Bi behaneyê ewlekariyê digel gundên kurdan ên suryaniyan jî têne vala kirin û sotin. Ev şer, koçberîya suryaniyan hêj bêhtir xurt dike.

Wekî din, beriya têkoşînê, suryanî li ber çavên kurdan bi tenê file (xirîstîyan) bûn. Lewma jî ew musteheqê hemû kotekiyan bûn. Wekî biyaniyan dihatin pejirandin. Lê îro ez dibînim ku ev bîr û bawerîya kurdan ya berê hatiye guhartin. Îro suryanî li gorî bîr û bawerîya kurdan "gel" in..



Helbestên wergerandî

FERÎDÛN MÛŞÎRÎ

Jan

Ez nizanîm
û ev derd min pir diêşîne.
Çima mirov,
ev zana
ev Pêxember
di çûn û hatina xwe de
rê nabe ser mucîzeyê evîndariyê
ev nîşana çî ye?

Ev nîşana çî ye?
ku hîn dilovaniyê nas nake?
Û nîzane bi devlikenî li yekî din binêre
çî seyrbûneke nehênî ye!..

Ez di wê baweriyê de me
ku li cîhanê qencî
(Bi Xwedê) hêsantirîn kar e.
Û nizanîm çima mirov
ta vî sînori dûrî qenciye ye.
Û ev derd min pir diêşîne

Ji farisî: Jan Dost

MUSTAFA XALIKÎ

Helbesta Bênav

Dilan di dilanê de
şîn bi ser şînê,
ev kî ne?
Ev ayîn
ev rûçik yê min e?
Gelo ez im
yê di stûyê wî de toq
mêjiyê wî qeyd û bendkirî,
di nava keriyek dîl de
laşê di nav xakiyan de
hatiye çewsandin?
Gelo ez im
yê bi tarîtiyê hatiye fetisandin;
ew sawîra ku ronahî wînda kiriye
di nava wan çavên "tîsîna mar" de
mayî ye
û..

Ji keriyê xwe hatiye dizîn
di nava artêşa serketî de
bi ala sipî?

Na!
ne ez im, ez ê di mirêkê de...
Ne ez im
yê di tarîtiyê de stran digotin.
Serheldêr im ez!
Avên bicoş difûrin
xilava sor dipijiqe ji mêjiyê min.
Asê me ez.
Agirê çîyan
çiyayên birûmet
çiyayên serhildanê
Û...

Bi serketî
di dilê min de
di zend û çavên min de
hene ku
çoşa bi wê
mîna mizgîna cejnê...
Çiya, çiya, lû çiyano!

Ji tirkî: Bro Omerî

MARÎA WÊYNE

Cihan şê e

Min be şadmaniya demwîst
basî xoşewîstî bikem
basî aşî le ewîn da,
belam cihan şê e
ew katey niye bo ewîn
tenha bo rîq...
Ew katey niye bo jîyan le aşî da
tenha bo mirîn.

Min be şadmaniyewe demwîst
basî aramî bêdengî bikem...
Ew hêrize xuriskey le ser çawim
bêdengî derwê,
belam cihan şê e...
Ew katey niye le serewe biwestêt
maweyekî hendê dirêj, gwê bigrêt
cihan
mûşekêkî bedemewe.

Min be şadmaniyewe demwîst
basî ciwanî agir bikem,
basî berd û
ew rastiyey le berd daye,
belam cihan şê e...
Ew katey niye bo ciwanî
tenha bo têkşikanî ciwanî,
ew nîkayey niye bo gulî agir
tenha bo çekî agir
ew be karhênaney niye
bo rastî le berd da
tenha bo reqî berd.

Min be şadmaniyewe demwîst
le gel bêdengî da bijîm û
le gel ew endêşeyey ke
le bêdengî da le dayik debê,
belam cihan şê e...
Bêdengî be cê dehêlî
rûwew mirdin.
Endêşe be cê dehêlê...
Rûwew rûwekî jehrawî ye.

Le swêdî: Mehabad Qeredaxî

NEGWÎN

Xweşiko

Li min nenêre
çavên te min dikujin
û...
min diêşînin.
Ew kêra ku di destê min de ye
dema ez pê xwîna te dirjînim.

Kavil
Di kûraniya dilê min de
hezar jin dikin hewar.
Giraniya temenê mîrekî ku
evîne ew bi dar ve kiriye.
Êşa teyreki ku
baskên xwe wînda kirine.
Ariya sed şewatî,

erê...
ez im ya girêdayî
bi şikêstina sed salan.

Temeno

Ez êşek bêzîman im.
Temenekî ku
di rêçikên mirinê de tarûmar bûye,
lê dema tu tê cem min,
temenê min
li min vedigere
di eynî kêlikê de.

Rastî

Li ser wê rêçika ax
çiqasî min dixwest
ez bi te re bim.
Û mîna zarokekê
duwazde salî
min di bin çavan re
li te dînerî.
Û ez vediceniqîm:
Ev çî xewn bû!

Bendeman

Piştî yazde salan
ez li te vegeyriyam,
Rê, avahî, lawir
giha û dar,
kevir û gor
tevde hatin guhertin.
Porê min dirêjtir bû.
Çavên min xemgîntir bûn.
Tu tenê,
tenê li ciyê xwe ma û ma.
Di nivê dilê min de.
Negwîn

Ji erebî: Helîm Yûsiv

GÛLBAHAR ÜNLÜ

Ez guleke payizî me

Bihar
keştiyeke noqbûyî ye.
Viyan
kevza xwe kom dike li dora xwe.
Bilbizêkên çiyê belave dibin li piyakan.
Bûka teze,
bi nazdarî li kolanê dipengizî...

Gava ku surîşt digel xwe bi ceng bû
gula nûbişkivî zor dida reha xwe
bi hers dipijiqî, rakêşayî...
Tengezar bû,
li cihê xwe neditebitî.
Mirovekî biyan ber bi wê ve hat û:
"Di himbêza Enedolê ya zuwa de,
guleke wisa" digot zehî mayî...
Bêyî ku destê xwe ji pê bike
Bi çavên xwe-yên girs lê nerî
paşê, wînda bû ji bin dara tûyê.
Şepirzeye gul
di nav bêdengiyê de.
Bi awirên xwe yên kûr û dûr
sewitî

peritî
dagirtî raz.
Li ber ji destçûya nedestkeftî ket;
dibe ku vegere, digot û
ma bendewar û alizî.

Sal,
bi rehwanîya canûkek bê zengo
firiyan, çûn...
di rojêke têrhetavî rezbandanê de,
di wî xanîkê kilskirî û kevnar de,
di wê penceroka cam şikêstî de,
te wê sorgula jibîrçûyî dit...
dilsar û xemgîn, hinavê te derizî.

Gula ku bêwext vedibe.
Gula ku şahiya wê,
bangîniya wê
di rengê wê de qat qat dibe
dibêje:
Di vê pencerokê de bi salan
li hêviya te mam.
Digel delodîniya hemî dansalan,
li rengê xwe
li bîhna xwe xwedî derketim.
Ne ji serma de
digel nîgaşa te dil lerizî.

Bendewar mam.
Bi arameke Xwedayî ez bendewar

Dara tûyê bîner e,
di rengê te de
di van tengekolan re kes danebe
Tu pir dereng hatî.
Xwezîkên dilê min
bi dirêjiya demê re basko bûn,
dêm û rûyê min tevizi.
Gava min tu ditî
hinavê min nelerizî...
Xewna minî şêrîn,
bizîvire
here cihê tu jê hatiyî,
tenha li vê wêranxanê dixuşe
bayê peyizî...
Ez guleke peyizî me.

Zarokî

em dibin şaristanî
binive minal
demokrasi heye
binive minal

wê deyn ji te bibarîn
mezin nebe minal
em gemari dibin
nekene minal

li rewşa me ya pîrgiryan
bikene minal
bertîl peyapey in
deng neke minal
ne çîrok in ez dibêjim
xwe veşêre minal
apên te ên xirab bêyarîne
tepa min li te, ku dibêjin
wê te bikujin

Ji tirkî: Dildar



Li navendên çandê çalakiyên vê hefteyê
Li NÇM'ya Stenbolê

● 30.03.97 Yekşem: Konsera Idil Kültür Merkezi û NÇM'ê: Agirê

Jiyan û Özgürlük Türküsü, saet:14.30

Şanoya Hêlîn - Bayê Elegezê, saet:17.30

● 5.04.97 Sêşem: Konsera Koma Gulên Xerzan, saet:14.00

Şanoya Hêlîn- Bayê Elegezê, saet: 17.30

● 6.04.97 Yekşem: Konsera Koma Rojhilat, saet:17.30

Şanoya Hêlîn-Bayê Elegezê, saet:17.30

Li NÇM ya İzmir'ê

● 30.03.97 Yekşem: Şeva piştigriya xendevanan. Konsera
Koma Rewşen (ji NÇM'ya Edeneyê), saet:14.00
Li BEKSAV'ê

● 30.03.97 Yekşem: Xweseriya ramana diyalektîk a xwezayî
(Li ser însan, ziman û wateyê), Hüsni Aksoy, saet:13.00

● 30.03.97 Yekşem: Danasîna pirtûka Erol Çatma "Zonguldak
Madenînde Hükümlü İşçiler (Karkerên Girtî yê Li Madena
Zonguldak'ê) û Pêşandana wêneyên Karkerên Girtî yê Madena
Zonguldakê, saet:15.30

AWIR

Amed de Newroz



Di taxê sükêrocawanî de cîniyêk bi namê xo Leyla Varsak, qey protestokerdenê Liceyîyan ku bi zor kerdê koricî xo eşî miyanî adirî. Şarî Leyla Varsak bi zor a miyanê lastîganê veşayan ra xelesna. Cîneke linganê xo ra veşay bî.

Sewê vîst û yewê aşme de şarê Amede zehfê cayanê sükî de lastîkê wesaitan vistîbî ta. Di taxê Xetakore (Korhat), Yeniyozîwa (Kuruçesme) û Kiyânêhizûrî (Huzurevleri) de şarî şewera bi govend, çepik tililî û dirûşman dest bi pirozkerdişî kerd.

Rocê vîst û yewî de pêro taxanê sükî di cay xo de roşan pîroz kerd. Zehfê şarî de sükêrocawanî (Batikent) de risa pê bi texmîne ma û gorê vatan şar zêde vîst hezarî bibi. Xetakore de hewt-heşt hazar, Yeniyozîwa de şeş-hewt hazar, Kiyânêhizûrî de hirê-çar hazar û taxanê bînan de zî mardimanê ma bi kêf û heskerdena Newrozî pîroz kerd.

Serê siwey polîsanê sivîlan û resmîyan hevey cayan de midexley şarî kerd, la balê senî ku şêlik zêde bî, înan zî fek eno karê xo ra verada. Di sükêrocawanî de polîsanê tîman serê siwey çend merdimê heyetêka xerîwe bi zor girotî û bi kaşkerdene waştî wica ra berê, la belê badû cû amey verdayin.

Şarî wicade serê siwey ra heta saet çarê şanî car cayan de adiro gur vistîbî ta û govende, çepik, tililî û durûsmey (slogan) eşî. Durûsmey ku ma tesbît kerdî enê bî: "Newroz ê ma wo, go ê ma bîmano", "Gerîla dano pero, Kurdistanî nano ro", "Roşanî Newrozî pîroz bo", "Kurdistan faşizmê rê goristan bo", "Kutikê Türkesî nê eşkenê ma

vindarnê", "Wa zîndanî veng bê, girotey azad be", "Çetey teverayê HADEP'î zindan de yê", "Bijî Serok Apo", "Bijî ERNK, ARGK, PKK"...

Di taxê sükêrocawanî de cîniyêk bi namê xo Leyla Varsak, qey protestokerdenê Liceyîyan ku bi zor kerdê koricî xo eşî miyanî adirî. Şarî Leyla Varsak bi zor a miyanê lastîganê veşayan ra xelesna. Cîneke linganê xo ra veşay bî.

Nimerocêk Cagirotoxê PDS'î (HADEP) Sedat Yurtdaş ame meydanê Sükêrocawanî û Roşonê Newrozê şarî pîroz kerd. Sedat Yurtdaş va: "Mî şîma rê Leyla Zana, Xetîp Dicle ra silamî ardê. Eno kêfê şîma ji bo waştîşê aşî û demokrasî ya..."

Saet çarê şanî de bi qasê heşt hezarî merdim ew ca verê xo şa taxê Ofisê de reyşiyayoxî vindertî. Verê banê HADEP'î de durûmê: "Çetey teverayê, HADEP zeredewa", "Gerîla dano pero, Kurdistan dano ro", "Bijî aşî", "Şehîdî nêmirenê" eşî û hewna dest bi reyşiyayîş kerd. Şêlik gama risa Cotber, polîsanî verê înan girot, şêlik jî cay xo de nişte ro. Timî bi çîwan û daran kewtî miyane milete û dest bi kuwayîş kerd. Bi qasê hîris kes ame tepeştên Em ser bi qasî 150 hazar merdim Amed de Newroz pîroz kerd.

R. LEZGÎN

TÎŞK

SÎRWAN REHÎM



Zindîkujê mirîperest

Çara yekemîn di payiza 1993'an de, min li Stenbolê ew nas kir. Bêguman min pêştir jî navê wî bihistibû, min navnîşan û hejmara telefona wî girtibû. Yanî min zanibû ew hunermendekî ne ji rêzê ye. Min zanibû ku wî ji şanoya xelkê re gelekî xizmet kiriyê, hem jî xizmetekî heja û berbiçav.. Yek jî stûnên wan ên herî xurt bû. Lê belê wan xelkan jî gelekî rûmeta wî zanibûn û bi giramgirî tiliya rêz jê re dirêj dikirin.

Êvara wê roja ku min ew nas kir, li NÇM'ê min berê pirsan da wan û pirs û bersiv li ser rewşa kurdên Sovyeta berê-bûn. Paşê jî min jê pirs kir: "Hûn ji Erîvana Ermenîstanê tîn, gelo hûn Ersên Reşîd Polatov nas dikin?" Kenekî şêrin li lêvên hevalê me rûnişt û bi hêminî bersiva xwe da:

-Ersên im.

-Bi-rastî?! Ez bi dîtina te gelekî kêfxweş im.

-Tu çawa min nas dikî?

-Berê hinek agahiyên min li ser ezmûna şanoyê li Sovyetê hebûn, her wiha ez gelekî bextewar bûm ku derhênerêkî me jî di nav şanoya wî welatî de cihê wî wisa xuya be û giraniya wî hebe.

Paştir em gelekî bi hev re man û me gelek sohbet kir. Sohbetên me bi giştî li ser rewşa Kurdistanê û bi taybetî jî li ser şanoyê bûn. Li pey van jî, ku min dersên wî dîtî li NÇM'yê û min jî nêzik ve îmkanê temaşekirina li derhêneriya wî dît, min di dilê xwe de got: "Belê, yanê hunermendên me yên mezin jî hene. Ersên bi wî temenê xwe, niha jî ku dilîze mîna xortekî ciwan wize (enerjî) jê dibare." Mînakên pandomîmê ku Ersên bi xwe didan û di laşê xwe de ew mînak berceste dikirin, mînakên herî zindî û bi can bûn. Mînakên wisa ku ne kêmi şewazên şanoya nûdem ên dinyayê bûn.

Di nav derhênerên cihanî de ku di warê şanoya pandomîmê de kar dikin, Ersên Polatov wekî derhênerê çaremîn tê naskirin. Bêguman kesê ku ji nêzik ve wî nas bike, dizane ku çaremîn pile (derece) jî bo wî ku ne kêmi be, zêde nîn e.

Di wan rojan de ku em bi hev re li Stenbolê bûn, pirtûkek pêşkêşî min kir ku li ser ezmûna wî ya pandomîmê bi ermenkî hatibû nivîsandin. Li ser rûpela yekemîn pêşkêşîya xwe wisa nivîsandibû: "Ji Sirwan re, bi hêviya ku em dîsa hev û din bibînin û karekî hunerî bi hev re bi encam bînin. Li Stenbol an li Almanya, lê ya herî xweş ev e ku em hev li Silêmaniyê bibînin." Belê Ersên bi van peyvyan pirtûk pêşkêşî min kir, lê mixabin ku di êrişî polîsan de li Stenbolê wekî gelek tiştên din ev pirtûka min jî winda bû.

Rojen seretayî (pêşîn)ku hatibûn Stenbolê li NÇM'ê li ser pandomîmê qise kir. Ersên bi gotinên nivîskarekî ermenî dest bi gotinên xwe kir: "Mirov hene ku bûne bar li ser piştê cihanê, mirov jî hene ku cihanê wekî barekî bi piştê xwe hildigirin." Der barê şanoya pandomîmê de jî gelek qise kirin, paşê jî got: "Çima şanoya bêdeng?" Bi xwe bersiv da û got: "Gava peyv rûmeta xwe winda dike, ceste (laşê mirov) dest bi xeberdanê dike."

Li ser Ersên û hunera wî çiqas bipeyivim hê jî hindik e. Lê belê mebesta gotina min ew e ku ew hunermendê ku em basê dikin, niha dema wî hemû bi karê wî yê nû derbas dibe. Şaş nemînin ku Ersên piştî ew qas serdestî di hunera xwe de, niha dest bi karekî nû kiriyê. Na şaş nemînin, karê wî yê nû jî bo bidestxistina gepek nan e. Belê Ersênê me berê xwe daye îranê û niha li wî welatî karê boyaxçîtiyê dike.

Sibe ku Ersên bimire, emê civîn û bîranînên xweş jî bo wî çêbikin, lê niha nanê Ersên tune ye, ne xema tu kesî ye jî. Bi rastî em zindîkujê mirîperest in. Yanê em mirovên xwe yê hêja bi destê xwe dikujin û paşê di mirinê de hêjahiya wan tê bîra me û em ji wan re gotinên xweşik li pey hev rêz dikin.

Hunermendê delal.. Dizanim tu ji wan kesan î ku cihan wekî barekî giran li ser piştê xwe hildigirin, lê di vî demê de ku "peyvyan rûmeta xwe winda kirine" ez jî ji bo rewşa te nikarim tiştêkî bibêjim.

Rihan

Li herêmekê keçikek hebû, navê wê Rihan bû. Diya Rihanê çûbû rahmetê. Bavê wê bi jineke din re zewicibû. Ji wê jina wî jî keçek dibe, ew û Rihan bi hev re mezin dibin.

Her sê bi hev re diçine palehiyê. Jinbava Rihanê jê entê digire. Her du keç ji eynî sewilkî (şerbik) avê vedixwin. Rojekê jinbav xerabiyekê (ji bo Rihanê) dihizire. Jinbav dihizire ku sawilkekî din peyde bike û çêliyekî maran bike sêwilk û bide Rihanê. Jinbav wekî ku hizirî dike. Sewilkê avê yê ku ji bo Rihanê standî çêliyekî maran dikê û dema diçin palehiyê dide Rihanê. Ji keça xwe re jî dibêje ku qet ji sewilkê Rihanê avê venexwe.

Rihan ji westîna, ji tîna tava havînê pir tî dibe û dibeze sewilkê avê, bi carekê re bi ser xwe de dadike. Çêliyê mar dikeve qirika wê. Dema ku çêliyê mar dikeve qirika Rihanê, ew diqêrê:

– Dayê tiştê kete qirika min, dibêje.

Jinbava Rihanê:

– Qey dasiyeke qîza min. Avê bi ser de vexwe, dibêje; wekî ku ji her tiştî bexeber be.

Rihan ji wê rojê şûn de ji zikê xwe nexweş dibe. Her ku mar mezin dibe zikê Rihanê jî mezin dibe. Rojekê jinbava Rihanê ji bavê Rihanê re:

– Mêrik, ev çend roj in ez dîna xwe didime Rihanê, zikê wê roj bi roj mezin dibe. Ez guman dikim bêarîtinan kirine. Heger zarok jê re çêbibe, emê li ba gund û çîranan şerpeze bibin. Divê hîn zarok nebûyî tu çareyekê bibinî, ku tu wê bikujî, dibêje.

Bavê Rihanê sosret dimîne lê bi çavên xwe dibîne ku zikê Rihanê werimiye. Kûr û dûr difikire û paşê jî biryara kuştina Rihanê digire, ji jina xwe dixwaze ku tûrikê wî tijî mewij û helîl bike û radihêje çifta xwe. Ji Rihanê re jî dibêje ku ew dê ji bo îşekî îro biçine gundekî dûr.

Dikevine rê. Diçin diçin pir dûr diçin. Pir gund û çiyayan derbas dikin. Dilê bavê wê heye ku li serê çiyayekî dûr Rihanê bikuje, lê kezêba wî nagire. Li serê çiyayekî bilind, Rihan ji bavê xwe re dibêji:

– Ma emê hîn jî biçin bavo, ez gelek tî bûm.

Bavê Rihanê ji berê de dizanê ku kaniyek li wan nêza heye. Ji Rihanê re kaniyê nişan dide. Rihan bi aliyê ku bavê wê nişan dayî de diçe. Qederekê, li kaniyê digere, dibîne. Bilez serê xwe dike nav avê û tîr av vedixwe. Dema serê xwe radike dibîne ku marek di nav avê de dike qure qur. Rihan qevzekê paş de diçe. Qure qurek ji nava Rihanê jî tê. Marê nav avê bi zimanê xwe ji marê din re:

– Tu çi dikî di nava tîr û pizûran de?

Marê di zikê Rihanê de:

– Ev der xweş e, germ e. Ez dixwim

dil û gurçikan.

Marê nav avê:

– Derê ji wir. Te xwe kiriye qefesê. Binihêre dinya çi xweş e, hewa çi xweş e, av çi zelal e.

Di vê navberê de erq tîne Rihanê, vedirşe. Marê di zikê wê de derdikeve xwe diavêje nav avê. Dema mar ji ûrê Rihanê derdikeve, Rihan rehet dibe û bitirs ji ser kaniyê vedigerê ba bavê xwe, lê bavê wê ne li wir e, çûye. Kurkê xwe û tûrik bi telanekê vekiriyê û ew nexuyaye. Vir de diçe, wê de diçe lê bavê wê nîn e li wan deran. Bi tenê maye li serê wî çiyayê ku nedizanî li ku ye. Diqehere, ditirse, nizane bi ku de biçê. Li nava tûrik dinihêre ku ji dêla mewij û helîlê bişkul û qetên sergînan tê de ne. Fam dike ku leyistika jinbava wê ye.

Li ber telanê rûdine, serê xwe dike nav destên xwe û diponije. Dibe êvar, li wir ditirse diçe serê darekê. Bêdeng radiweste. Çend roj di navberê de diçin, zefî dibe, ji tîn û birçîna, lêvên wê ziwa dibin, diterikin. Ser û kincên wê qetiyayî di rewşeke perîşan de li serê darê radiweste.

Rojekê nêçîrvanek bi tajiye xwe ve

diçe wan çiyayê nêçîrê. Dema tajiye nêçîrvan digihêje binê dara ku Rihan li ser e, disekine. Serê xwe bi banî de dike û direyê. Nêçîrvan ji hespê xwe peya dibe, tê li serê dara ku tajiye wî li binê direyê dinihêre. Rihanê dibîne, di rewşeke perîşan de ku nedîşiba mirovan. Nêçîrvan ji Rihanê dipirse kî ye, çi ye, li serê wê dare çî dike. Lê Rihan xeber nade. Hey nêçîrvan îsrar dike, lê Rihan ji serê darê danayê xwarê. Nêçîrvan dev jê bernade, bi kotekê wê tîne xwar, li pişt xwe siwar dike û hespê xwe ber bi mal ve dibezîne. Rihanê dibe mala xwe. Hal û meselê ji diya xwe re dibêje. Wextek tê ve diçe Rihan û nêçîrvan dizewicin. Du zarokên wan çêdibin. Lê hîn jî Rihan naaxive. Kesek nizane Rihan lal e an jixwe xeber nade. Rojekê di civatê de nêçîrvan behsa xebermedana jina xwe dike. Ji civatê yekî şareza wê şîretê li nêçîrvan dike:

– Here sêvekê bikire û bide zarokêkî ji yê xwe, nede yê din û xwe li derekê veşêre li wan temaşe bike. Heger ne lal be dê biaxife, dibêje.

Nêçîrvan şîreta mirovê şareza bi cih tîn; sêvekê dikire dide zarokêkî xwe û xwe vedîşêre. A din bêpar dimîne. Zaro-

ka ku bêpar dimîne digirî. Li ser vê yekê jina wî:

– We serê bavê xwe nexwarî. Hejira bila du sêv bîstanda, dibêje.

Dema nêçîrvan wê dibihîze ji jina xwe re dibêje tu ne lal î, lê çîma tu xeber nade?

Serê wê Rihan dîsa xeber nade, bêdeng dibe. Çend roj tê re diçin mêrê Rihanê xesûwa wê kotekê lê dikin ji bo ku xeber bide. Her wiha Rihan bi şerta ku wê bibe mala bavê wê, dê xeber bide.

Nîçîrvan şertê wê dipejirîne. Li hespê xwe siwar dibe, diçe li mala bavê Rihanê digere û dipirse hetanî ku gundê bavê Rihanê dibîne. Dibêjin: Meriv bi pîrsî diçe xursê. Ev pir rast e. Vedigere mala Rihan û zarokên xwe jî dibe û diçine mala bavê Rihanê.

Li derî dixin. Dibîne mewanê bavê Rihanê rûdinin, şivê dixwin, lê Rihan xwe nade nasîn. Ew jî qet bîra Rihanê nabîne. Ew dibêjin qey gur û hirçan Rihan xwarîye. Rihan wekî ku ji malê ye diaxife. Ji bavê xwe re:

– Apo ka ji me re xeber bide, tu qet xeber nadi.

Bavê Rihanê:

– Ma ezê çi xeber bidim, tiştê nîna ku ez bibêjim.

Rihan dîsa:

– Hema ji me re meselokekê, serbûriyekê bêje.

Bavê Rihanê dîsa dibêje: Tiştê nîna ku ez bahsê bikim. Li ser vê yekê Rihan dibêje:

– Naxwe ezê çîrokekê ji we re bêjim û dest pê dike serbûriya xwe dibêje.

Dema ku Rihanê serbûriya xwe digot, jinbava wê seba ku binê xwe şil e, her axaftina wê dibirî û:

– Wele me çîrokên wisa nebihîstine, digot bi rik.

Rihanê dema serbûriya xwe xelas kir, bavê Rihanê pîrsî ku wê çîrokê ji ku dizane.

Li ser vê Rihanê xwe dide nasîn û jî bavê xwe re:

– Heger tu dixwazî ez te bibexşînim û li ba te bijîm, divê tu wê jinikê bikujî.

Li ser vê yekê, bavê Rihanê daxwaza wê bicih tîne; jina xwe dikuje, bi hev re dijîn û bextewar dibin.

Çîroka me li nav deviyar

Rahme li dê û bavê me hemûyan

BERHEVKAR

IBRAHÎM ALTÎNÎŞ



Jêrenot: Hefteya çûyî di vî rûpelî de ji ber sedemeke teknîkî, dawîya çîroka 'Girnewas' û navê nivîskar derneketibû. Dawîya çîrokê û navê nivîskar bi vî rengî ye:

....bêhna fêkiyê Newala Bûnîsra tameke bihuştî difûrand. Zeynî û xalê xwe ketine xewê pixepixa wan bû. Lê Behiya ma li benda cinên dilovan...

HESEN ZINAR

Kovareke nûderketî û pirtûkek

“Zimanê me. Heger zeman bi zimanê xwe peyivîbûna, dibe ku ji gotinê re cih nemaya. Her çiqas ku em pêdiviyê bi axaftinê dibîmin jî, bi kêmanî hinde jî divêt gotina me ya ku wê bêgotinê hebe...”

Belê, di destpêka sergotara xwe (bi tirkî) ya hindik û rindik de wisa dinivise kovara mehane ‘altamira’.

Kovara ‘altamira’ ya ku ji layê komîkek ronakbîrên nûhatî ve tê weşandin, bi mijarên xwe yê balkêş û bi

naveroka xwe ya dewlemend ku ji çîrok, helbest, helbest û nivîsên werger û ji nivîsên felsefî pêk hatiye, bi yekemîn hejmara xwe ya meha adarê derket pêşberî xwendevanan.

Heger ev kovar, bi şeweyekî hûrbînî ji layê xwendevanan ve bête berçavkirin, wê ji layê her xwendevanekî pêjinker (hessas) ve xweş bête dîtin ku di navbera wê û kovarên dîtir de cudayîyeke berbiçav heye.

Berî her tiştî, wekî ji naveroka nivîsan jî diyar dibe, ji kovarên dîtir cuda xebatkarên kovara ‘altamira’ yê dîrî zimandirêjî û quretiyan, bi armanca derxistina kovareke nûjen ku karibe bi hesteke mirovane û bi şeweyekî herî hindik û rindik, li gorî daxwazê bersiva arîşeyên civakî bidin, nerm, bêdeng, belê bi xwe bawer dixebitin.

Xebatkarên kovara ‘altamira’ bi van gotinên xwe yê balkêş û ji dil, bi rastî jî baweriyêke mukum pêşkêşî xwendevanan dikin.

Kovara ‘altamira’ ya ku digel bergê xwe ji 24 rûpelan pêk hatiye, bi du zimanan, tirkî û kurdî derdikeve. Hêjayî gotinê ye ku zimanê nivîskarên kovarê, kurdî û tirkîya wan gelekî vekirî û rewan e. Mijarên ku tê de cih girtine, ji layê nivîskar û xebatkarên ve bi zanayî hatine hilbijartin û bi şeweyekî hindik û rindik, bêtî ku xwendevanan zivêr û tengezar bikin, hatine danandin.

Di baweriyê min de jî, kovareke ku ji bîst rûpelên tîrnaverokekî pêk hatiye, bi gelekî çêtir e ji kovareke pir rûpelên kovara békakîl.

Naveroka yekemîn hejmara kovarê ji nivîs, çîrok, helbest û wergerên van nivîskarên pêk hatiye. A. Oğuz, Ayşegül, M. Demirci, Z. Öztürk, Cem Ortakaya, Zerdo û Kaan Çelik.

Min divêt bidim xuyakirin ku bejê tirkî jî yê kurdî bi gelekî bêhtir e. Heger ev rewş jî layê xebatkarên ‘altamira’ ve bête berçavkirin û yeksaneyek di navbera her du zimanên kovarê de bête peydakirin, di nerîna min de wê baştir bibe...

Şahmaran

Ev pirtûka ku ji 40 rûpelên nivçe û çîrokeke gelêrî pêk hatiye, ji layê nivîskar Gabar Çiyan ve hatiye berhevkirin û ji layê weşanxaneya Jîndan ve di heyva adara 1997’an de li Swêdê hatiye weşandin.

Berhevka naveroka ve çîroka gelêrî ji ya resen bi dîr xistiye û ev çîroka gelêrî li gorî rewşa îro ya li ber çavan, bi şeweyekî şanoyî û bi naverokeke ‘hevçerx hûnandîye. Çimkî, di çîroka resen (esil) de kesên bi navên ‘Cengîz û Tûran’ tune ne.

Her wisa berhevkarê Şahmaran, çîroka xwe bi zimanekî gelêrî, bi devokê herêmî û bi kurdîyeke şikestî û lawaz darjîtiye.

Ji layê berhevkar ve hinek peyvên ku li tu deverên Kurdistanê gelê kurd wekî berhevkar pê kar nakin, hatine bikaranîn. Ez dixwazim bi nimûneyekê ve şikestin û lawaziyê bidim xuyakirin.

Di rûpelê 9’an de paragafeke wisa derbas dibe:

“Di xewna xwe de, ew, li ser piştê hespa xwe li derûdora bajarê Darê derketiye seyde û di pey şopa xezalekê de ye.”

Berî her tiştî ‘hesp’ nêre, ne mê ye. Ya dîtir jî, ne ‘dipey şopa xezalekê de ye’, yan li ser şopa xezalekê ye, yan jî daye ser şopa xezalekê.

Ji ber tengiya cih, min nevê ez vê babetê dirêj bikim, heger na, nimûneyên bi vî rengî di pirtûka Gabar Çiyan de gelek in.

D.Ş. TIZYANÎ



Fêrisên Gelê Kurd

MEDENÎ FERHO



Gelê kurd, ji hêla gelên demedoran ve bi mîrxasî, mazûvaniya ciwanmerdî, canfedayî, sozdar û dilpakî tê naskirin. Her wiha, ev nîrxên giranbuha yê wesifdaryê bi giştî dibin fêristî. Fêrisî jî bo mirovan wesifdan û pesindana têr nîrxên giranbuha yê dawî ye. Rostemî zal, Qaratacdîn, Şevrev fêris bûn. Ehmedê Xanî, Feqiyê Teyran, Mîr Celadet fêris bûn. Ihsan Nûrî Paşa, Barzanî, Şêx Seîd Fêris bûn. Musa Anter, Mazlum Doğan, Delîl fêris bûn. Bêrîvan, Ronahî, Zîlan fêris bûn. Feyzîkê Biçûk, Nayîfê Haco, Babekîro û Gelo yê 80 salî fêris bûn. Burhan Karadeniz ku li ser erebokê rûniştîye û şev û rojê dike yek, ji bo medya kurdî dibezze, fêris e. Zelal, ku du destên xwe gorî kirine, Ehmedê Pêrîkî ku her du lingên xwe gorî kirine, hê jî şev û roj dikine yek ji bo azadiya Kurdistanê kar dikin, fêris in. Her wiha bi hezaran kesên canfedayên kurd hene, lê cihê me têra navê wan nake. Dil dixwest ku yek bi yek navê wan bihêjmêrin.

Gelo ji van mirovan mezintir fêris û mîrxas hene?

Berî ku hûn bersiva vê pirsê bidin:

Ew fêris in ku stana Kurdistanê ji nava piyê hespên hovê axirdemê xelas kirin û li ser koklika xwe danîn, di nava gerstêrka (gezegen) cîhanê de, di nava nexşeya rengîn de bi cih kirine.

Ew fêris in ku xîret û rûmeta stana Kurdistanê bi şax û per kirin, di ser piştê ewran re firandin, çiya newal, deşt û derya gevastin, li nava gerstêrka cîhanê teva gerandin.

Ew fêris in ku nîrxê Ferhad bi evîndariya pîroz, nîrxê Ehmedê Xanî bi pênuşê, nîrxê Cegerxwîn bi awaza wî, nîrxê Mihemed Şêxo bi ahenga wî parastin.

Ew fêris in ku kêlên cangoriyên Kurdistanê ji şikandinê, bêxwedîtiyê xelas kirin û bi bîranînen têr rûmet nixandin.

Ew fêris in ku tevzînokên tîrjolincî ji ser dilê gelê kurd rakirin, qedera terelem û xemgînî guhartin. Gokîerd (dunya) bi saya ve xwîn û kedê bûye tayîj û ber di bin lingê komên xelkê kurd de.

Ew fêris in ku bi canfedayî û cangoriya mezin mafê xwedatiya stana Kurdistanê kirine destên xwe û bi dilgewriyê mezin bifermoyî zarokên kurdan dikin.

Êdî gokîerd, li hemberî berdelên giran di bin lingê qedîrşînas û ne qedîrşînas de kirine bexçeyên gul û gulbijêrkan. Ew dergehên li dev û rûyê kurdan dihatin girtin û dabaşa wan qet di nava bûyer û pêhatiyên cîhanê de tunebû, îro li stana piştê vekirî ne. Kurd, êdî di çarçî û bazara cîhana têr xap, nîq û rîp (fen û fût) de giranbuha ne. Di mazatê (bazar) de,

dema navê kurd tê diyarkirin, bêdengî û bêpêjîni cih daye lihev zêdekirina nîrxandinê. Ev nîrx, bêguman xwedî derketin e.

Zanyarên kurdan yê navneteweyî tune ne!..

Nivîskarên kurdan yê navneteweyî tune ne!..

Teknîk, huner û çanda kurdan di nava netewan de cihê xwe negirtiye, lewra nîrxê bi berdêl nade!


Ked û xwîdana hezaran sal bi zordestiya dijminên harhare, ji rekiha hesinî xelas nebûye û negihaye çarçî û bazarên navneteweyî. Lê fêrisên Kurdistanê, di demek kin de bû dibistana vî karî û cîhan tev ne bes agahdar kir, fêris hebûn û nîrxê mezin kir.

Her dilopa xwînê ku rijîya ser axê, bû derman. Her parçê goşt ku bi serê dar û devî, lat û kûcan ve ma, bû melhem. Her axên û awaza ku li gelî û mesîlan bû lêlan û li hev vegeyriya bû neşter. Birîna jandayî pîr û pak kir. Nijdevaniya her roj û şevê, yan jî berbanga kewçêrê berê avê, ku bi hezaran sal e, ji bilî berjewendiya gelê kurd jî bo berjewendiya her kesî diherikî, wergerand û kire mal û mewdan û tekyan ji gelê kurd re.

Gelo pêwistî heye ku em kevn û nû beramberî hevûdin deynin û bikevine nava pîvan û hesaban?

Yan em bibêjin:

Ew fêris bûn ku xwezî kirin hevî!..



Padîşah û esrar

Waxtê padîşay de esrar şimitin serbest bi. Qandê coya milet esrar şimitê û rind nêxestiyayê. Padîşah seni ke ewneno keso rind nêxestiyeno, veydeno wezîrdê xo û vano:

– Ma se bikim, milet a pêro esrar şimena û rind nêxestiyena, wina nêbeno, tiyê vanê ma se bikim?

Wezîr:

– Ezo vana ma esrar şimitin hewadim, ma wina kerdin de kes nêşeno bişomo.

Padîşah:

– Temam şo milet ra vaji, Padîşay esrar şimitin hewadavo, kam ke na saet ra tepya esrar bişimo se, odo ceza bi do ci.

Wezîr hema şino û milet ra vano. Seni ke milet ewnena şimitin hewadiyavo, nê ji vanê, ma nûwa tepya ji bişimimi, la belê zey verî akerde akerde meşimimi,

miyanî miyanî(dizdiyê) bişimimi. Nê şimitini wina dom kenê, la belê nînan wina kerdin de nafin kes netepşiyeno, Padîşah ewneno keso nêxestiyeno hema hêrs beno û veydeno Wezîrî û vano:

– Ma esrar şimitin hewa da, la belê tevayrê nêbi, mileta fina (onca) şimena la belê ma yê kesî nêvînem ma se kim?

Wezîr:

– Ezo vana, ma zey milet, kincu (çina) xo ra dim û şimi milet miyan, ma wina kerdin de, êkê şimenê înan tepşim û ceza bidim ci.

Padîşah:

– Rindo ma hema wina bikim.

Padîşah û wezîrî ya hema kincu danê xo ra û şinê milet miyan, milet miyan de geayrê geayrê la belê kesî nêvînenê. Padîşah hema hêrs beno û destê xo erzeno herm (kol) dê Wezîrî û xo dima kaşkeno. Hema Wezîr vano:

– Padîşayê mi no delal tiyê se kenê.

Padîşah:

– Ezo vana to çekrî (berzî) bahr.

Wezîr:

– Padîşayê mi no delal, ti ji zanê ke verî ji tiya kesî nêşimîtê, ezo vana: bê ma sandal nişim û şim a kişta, bahrî çimki verî wija zaf şimayê.

Padîşah hema hermê Wezîrî viradeno û nê şinê sandalan het, ewnênê jû sandala rind û newî esta.

Padîşah:

– Wayirê na sandal qam o?

Wayirê sandal:

– Ezo, xeyro?

Padîşah:

– Ma yê wazem şim, a kişta bahrî ti

ma çenda benê?

Wayirê sandal:

– Di zerî (altûnî) bidê şima berî.

Nê nişênê sandal û yenê werte dê bahrî wayirê sandal vano:

– Musadeyê şima esto se ez xo rê jew cixare bipêşî?

Nê vanê musadeyê ma esto xo rê cixare bipêşî.

Wayirê sandal hema xo tûnik ra esrar vejeno, pêşeno û cixareyê xo fineno ci. No seni ke cixarey fineno ci, Padîşah û Wezîrî ya xo ji şimenê û qandê coya nê nêşênê vind rê. Nê hema wayirê sandal ra vanê “Cixareyê xo bîdî jû firt ji ma bişimimi?”. Wayirê sandal hema cixarey dano û jû firt Padîşah û jû firt Wezîr şimênê û peyser danê. Wayirê sandal cixarey qedînenê û kewno ray. No aredî Padîşah Wezîrî ra, Wezîr Padîşay ra vano ma tepîşt. Padîşah Wezîrîra vano ma ke şim kinar (destê bovê) o wext xo eşkerî kim.

Wezîr:

– E e ma winî bikim.

Nê seni ke visenêra bover (yenê kinar) Padîşah vano ez padîşaha, Wezîr vano ez Wezîra û vanê ma to esrar şimitin de tepîştê, ma wa piya bê. Nê seni ke wina vanê, wayirê sandal wiyeyê sandala reseno nînan û dano piro û vano la kûtikê ser dê siloy şima jû firt şimit, jew (yew) biyê Padîşah jew biyê Wezîr şima ke hendê me bişimitayê jewê şimadayê Pêxamber jewê şimadayê, Homa (Allah) biyayê. Padîşah û Wezîrîya xeylê kotegî wenê ci û kewnê dûrî.

MEMED DREWŞ

BIXELAT...

XAÇEPIRSA BIXELAT (61)

XAÇEPIRSA

BER	HER	EV	KIRIN
SERT	AMOZA		
ŞEVİN	KEJAK		
NMIR	RENİ		
ÜMAK	ZANİN		
SEN	DEM		
LTD	NEMA		
AYŞEŞAN			
İRA	MORT		

Bersiva Xaçepirsa 59'an

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, emê wan binirxînin û bi rîya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 61'an pirtûka ROJEN BERNAS "HINGÊ" ye

Jêrenot:
Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.



Pênc kesên ku xelata xaçepirsa hejmara 59'an, kaseta Koma Amed "Dergûş" qezenc kirine: Nuray Hatun/ Malatya, Tuncay Bal/ Manisa, Talat Dayan/ Sêrt, Cemal Kaplan/ Wan, Yılmaz Melek/ Stenbol

Qehreman ekî çiroka kurdî Millî	Prensê Cihê parastina mîrîyan	Gihaneke k Esker	Liq, şûbe	Madeyêke, saydam bajareke Iraqê	Tenkîd Kritîk
		3	Navê çiyayekî		
Mirişka avî Kampeke penaberan		5	Qelem, pênûs Cînavkek	2	
		6	Argon	Kukurt Xinzi, xîyanet	Tewanga navdheran ya tîpan
Plaka Mîstrê Amerikan yûm		Rewşenbîr ekî kurd			4
	Amurê porşehkir- inê Bizmar		Şehîdek (wêne)	Mal	
Alif Metod		Meşrû			
			Daçekek	Kûçik	
Xak Beyreq		Fêrgeha amadeyî		1	
	Hawar, gazî				

PEYVA VEŞARÎ → 1 2 3 4 5 6

Qewad

* Newroza 97'an bi gîseyên mezin hate pîrozkirin.



Li Kurdistanê Newroz

Li Ruhayê Newroz

Gelê Ruhayê cejna Newrozê li ber deriyê Samsatê pîroz kir. Heft hezar ten (kes) beşdarî pîrozbahiyê bûn. Ji van 2 hezar jin û zarok bûn. Pîrozbahiyê saet di 13.00'an de dest pê kir hetan saet 16:00'an dom kir. Serokê HADEP'a Ruhayê di destpêka pîrozbahiyê de agir vêxist. Pêşî Serokê HADEP'a navçeya navendî Reşîf Yardımcı û Serokê HADEP'a bajêr Celalettin Erkmen li ser maneya cejnê bi tirkî axaftin kirin.

Koma Zarokên Ruhayê heft stranên kurmancî û dimilî pêşkêş kirin. Ji NÇM'ya Edeneyê jî Koma Rewşen nêzikî 10 klam, stran û marş diyarî beşdaran kirin. Gel li meydanê 14 helqeyên govendê pêk anîn û ala kesk û sor û zer vekirin.

Di dawiya pîrozbahiyê de nêzikî 3 hezar keşî meşîyan û dirûşmeyên wekî "Kurdistan wê li faşîzmê hibe goristan", "Gerîla lêdixê Kurdistanê ava dike" avêtin. Polîs û tîmên taybet êrîş-birin ser meşvanan û 8 kes hatin girtin.

ÇILKANÎ



Li Êlihê Newroz

Li Êlihê (Batman) Newroz bi beşdariya hezaran hate pîrozkirin. Li cihên cuda cuda ji 20 hezarî bêhtir mirov beşdarî pîrozbahiyên bûn. Li dijî Newroza resmî gelê Êlihê jî rabû ser piyan û da zanîn ku Newroz cejna gelê kurd a neteweyî ye.

Batmaniyan Newroz tevî zar û zêçên xwe li taxan li dora agirê ku vêxistibûn bi dilan, stran û banga aştiyê pîroz kirin.

Li taxa Ipragazê 5-6 hezar mirovî, li Hilal sê hezar, li taxa GAP'ê sê hezar û

li taxa Karşıyakayê sê hezar kes beşdarî pîrozbahiyên bûn.

Li aliyê din pîrozbahiya dewletê bi fiyasko encam da. Walî Salih Şarman ji bo ku gel beşdarî Nevruzê bibe ji bo 5 hezar kesî xwarin da amadekirin, ji ber ku gelê Êlihê tu eleqê nişan neda, xwarin li rastê ma.

Walî Şarman xwest ku li taxa Ipragazê beşdarî Newroza gel bibe; wexta ku zarokan walî dît, sloganên "Bijî serok Apo", "Newroz a me ye û wê ya me bimîne", "Bijî aşî" avêtin.

AZAD ZÊRO

Ferhengok

awaz: meqam
belam: lê belê (fakat)
berendam: namzet (aday)
bijûn: paqijî, tendurustî (sağlık)
çov: de, şiv (sopa)
dasî: kelem, strî (diken)
derhêner: yapımcı
desthilatdar: serdest, egemen
dên: bal (dikkat)
eciqandin: guvaştin, (sıkma)
erk: wezîfe
ezmûn: tecrûbe
geleperî: bi berfirehî
gerstêrk: kewkeb, gezegen
girangirî: bi qiymet

gokîerd: cihan, dunya
helîl: xwarineke ji gebûlê (pelûlê)
hizirandin: ramandin, fikirin
kelepor: berhemên gelêrî
kevneşop: adet (gelenek)
lawij: stranên dila yêrî evînî
lijne: kurul
nemaze: bi taybetî (özellikle)
nêziktêdayîn: yaklaşım
niştecih: ahalî (yerli)
parkît: ek
pêjinker: hesas (duyarlı)
pêrgîhatin: lê rasthatin

rakêşayî: asabî
raya giştî: kamuoyu
selmandin: peytandin, îspatkirin
sergîn: tepika rêxê, tezek
sewillk: şerbikê avê
şepirze: perîşan, rê li ber wendayî
şewaz: uslûb (târz)
şewirmend: danîşman, müsteşar
sinc: ehlaq
tebitandin: aştkirin, bédengkirin
tîrêj: ışın
tixûb: sînor
teşe: awa, şekil
westîn: mandîbûn, betilîn
zanistî: ilmî (bilimsel)

WELAT

Rojnameya Hefteyî
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
Zerya Basın ve
Yayıncılık
San. Tic. Ltd. Şti.
(adına)
Xwedî (Sahibi)
CELALETTİN
YÖYLER

NAVNİŞAN
Ayhan Işık Sk. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL
TEL-FAX
(0 212)
251 90 13.

Gerînendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
SAMİ TAN

Berpîrsê Karên
Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
DÜZGÜN DENİZ

Berpîrsê Saziye
(Müessese Müdürü)
TAHİR ELDEMİR

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık
A.Ş.

BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım

NÜNERİTİYÊN ME
(Temsilciliklerimiz)
Nimînendeyê Giştî
yê Ewropayê:

M. Rojava

Suriye: Jan Dost
Helîm Yûsiv

Berlin:

Silêman Şîdo
49-30-69002695

Hannover:

Selîm Biçûk
49-5721-81360

Munchen:

Mahmut Gergerli
49-871-670884

Bruksel:

Medenî Ferho
32-02-466037

Stockholm:

Robin Rewşen
46-8-7510564

Bonn:

Ahmet Baraçkılıç
49-228 66 62 49

Celle:

Wezir Saçık
49 50 52 87 36

Qel bersîva dewletê da: Newroz ya me ye!



Roja 21'ê Adarê li Edeneyê bîst û pênc hezar kurdî Newroz li Tiyatroya Mimar Sinan pîroz kir. Konsolosê Amerîkayê yê Edeneyê Josepn Pennington jî beşdarî pîrozbahîya Newrozê bû.



Kawa, Kawayê Hemdem û Kawayê nû ji xwe re şagirtan nû gihandin. Li Salona Abdi İpekçi roja 25'ê Adarê destana Kawa bi temsîlî ji aliyê şanogerên Teatra Jiyana Nû ya Navenda Çanda Mezopotamyayê ve hate lîstin.



Li salona Abdi İpekçiya Stenbolê 15 hezar kurdî Newroz bi pêşangiya HADEP'ê pîroz kir. Di pîrozbahîyê de şanogerên teatreyê sloganên weli "Bijî Serok Apo, li Efrasiyê şerê şoreşê, Genla İdare, Kurdistanê ava dike" avêtin.



Li Stenbolê li Efrasiyê şerê şoreşê, Genla İdare, Kurdistanê ava dike. Newroz ya me ye.



Newroz ya me ye.



Abdi İpekçi dayikên leşkeran Nadide Diker û Emine Çaçan û dayikên leşkeran Nev banga aştiyê kirin. Diya leşkerê ku di şerde hatî kuştinê got: "Kure min ne şemê e. Ez bawer nakim ku ew jê bawer e, lewra li vî welatê bira bira dikuje."